

- Roja 18'ê mehê balafireke ser a F-104 li Zapê ji hêla gerîla ve hate derbekirin. Keyîna balafirê ji hêla cerdevanan ve hate selmandin.
- PDK nikare sê qetlîamê ji stûyê xwe derxe.
- Ser li Bokur ji gur bû.

Cerdevanan li Qada şer veguherîne:

Bi Behan Leşker matin kuştin

Rûpel - 5

■ **Nirxandina A.SERDAR DERYA, li ser tevgera dagrikirina artêşa tirk: Şervan di şer da xurt dibin** Rûpel 6

■ **Hevpeyvîna digel Rayedarê IHD'ya Amedê OSMÂN BAYDEMİR, bi sernavê**

"IHD bi biryara MGK'ê hate girtin Rûpel 8-9

■ **ARAM D. li ser "Bîraweriya hunermendê nemir Tehsîn Taha" nivîsî** Rûpel- 10

■ **Lêpîrsîna MAZLUM DOĞAN bi sernavê: Divê kurd bibin kurdên Kurdistanê** Rûpel-15

NAVEROK



4

Fener Rojbiyanî: Parçebûna Kurdistanê û kurdên Başûrê Biçûk



7

Salihê Kevirbirî: Bi sebir, adil û bjarte bû



11

Li dijî dagirkirina Başûr reaksiyonên tuj

Ji Xwendevanan

DI têkoşinan de hin tişt hene dawiya têkoşina didin xuyakirin. Ji wan yek jî gel e. Belê em dikarin gel bikin sê par:

Para yekemîn zarok in. Ji kesên ku bibêjin zarok di nav têkoşinê de bi zanetî û bi bawerî hene re mirov dikare bibêje: Hûn xelet in. Bi rastî jî ew zanin, hê biçûk in û karê xwe bi hiş û bi fikir nakin, mezin ji bo mêzin in û di bin bandorên wan de karê xwe pêk tînin.

Ya duyemîn ciwan in: Bi rastî jî ciwan di têkoşinê hemû dinê de jî bi berdewamî cihê girîng digirin. Belê mirov dîsa jî dikarin bibêjin: Ciwan, hê xwîna wan dikele, qirarên xwe bi heyecan didin û agirê bi kelê di nav dilê wan de nahêle ku ew biryarên baş hildin.

Ya sêyemîn dayik in. Bi rastî kesê şefqat û rehmeta nav dilê dayikan nizanibe, nikare bizanibe ji bo çi dayik ji bo têkoşinê pêwîst in. Dema dayikek zarokekî xwe wînda dike, derdek, birînek dikeve dilê wê û her dem wîê tîne bira xwe û pê nexweş dibe. Têkoşin bi hemû serkeftin û şeng nîn e, mirin jî heye nekêfxweşî jî heye. Têkoşineke eger dayik jî hildabin nava xwe û ew dayik zarokên xwe jî bi dil, bi daxwaziya xwe şandibin nav têkoşinê û ji vê zêdetir bi xwe jî ketibin nav têkoşinê, ew dayikên bi kul û bi bawer nîşana encama têkoşinê ne.

ÎDRÎSÊ MELE MIHEMED



Partiya Serkaniya Giştî û bereya azadîxwaz

SAMI TAN

Ji zû ve tê zanîn ku li Tirkîyeyê û Kurdistanê du bere pêk hatine. Bereyek ji wan di bin fermandariya artêşa tirk de saz bûye û bi her awayî li dijî kedkarên tirk û azadîxwazên gelê kurd e. Serkêşa vê bereyê, di destpêka salên 1980'yî de ji bo şikandina tevgera şoreşger, dest danî ser rêveberiyê, heta salên 1983'yan bi awayekî vekirî, piştî vê demê jî bi awayekî niv-nêhênî karê dewletê dimeşîne.

Niha hinek kes artêşa tirk wekî nûnera pawana (tekeli) OYAK'ê, bi nav dikin, hinek jî wê wekî partiya desthilatdar, ango Partiya Serkaniya Giştî bi nav dikin. Ev partî xwedî rayeyeke di ser hemû partiyên re ye. Digel şerê ku li dijî tevgera kurd dimeşîne, ji aliyê siyasî ve jî ew xwediyê hinek stratejî û taktîkan e. Vê partiye jî destpêka salên 1990'î bi vir de li dijî gelê kurd "şerekî giştî" daye destpêkirin. Di vî şerî de hemû hêzên paşverû li dor xwe civandine. Di nav wan hêzan de jî çepgir û sosyalîstên sexte bigire, heta îslamiyên rejîmperest, gelek derdorên cuda hene. Mirov dikare van hêzên ku li derdora Partiya Serkaniya Giştî civiyane, wekî bereyekê bi nav bike.

Me got ew partî di warê siyasî de xwediyê hinek stratejî û taktîkan e. Di vî warî de ew ji ezmûnên dîrokî sîdê werdigire. Di nava hêzên li dijî xwe de pir-bendî û nakokiyên, heta ku karibe pevçûnê derdixe. Heke pêwîst be îslamiyan berî sosyalîstan dide, yan jî sosyalîstên sexte berî îslamiyan dide. Bi hêzên cur bi cur ên di nava bereya xwe de li dijî tevgera kurd propagandayê dide kirin. Ev kes wê bi terorîstî û nijadperestiyê sûcdar dikin. Heke nikaribe hêzekê bixe bin kontrola xwe, qet nebe dixwaze bi îdeolojî û çewt-agahdariyê bandorê lê bike. Ger di vî warî de jî bi ser nekeve, berê xwe dide wê hêzê û dixwaze wê ji holê rake.

Sloganê sereke ya vê partiye "Milî mutabaqat" e. Bi riya vê lihevkerina giştî, dixwaze hêzên dijber û azadîxwaz ji holê rake. Tê zanîn ku ew partî bi tesadûfî nebûye serkêşê bereya navborî, lewre ew li ser civaka tirk xwediyê bandoreke taybet e. Têgêra sosyalîst a tirk tevî hemû êrîş û kuştinên ku vê partiye anîne serê wê jî, ta car rasterast li dijî wê derneketiye. Ew tim wekî "hêzeke neteweyî û pêşverû" bi nav kiriyê. Rêxistinên herî radî-

kal jî, di nava wê partiye de li baskên pêşverû geriyane. Lê mixabin her tim jî wê partiye kotek xwarine.

Sedema vê yekê jî bi bandora bîrdoza wê partiye ve tê girêdan. Bîrdoza wê partiye wekî tê zanîn kemalîzm e. Ev bîrdoz li ser tevgera çepgir ewqas xwedî bandor e ku hê jî hinek rewşenbîr û rêxistinên wê partiye wekî hêzeke pêşverû û (digel ew qas dij-şoreşên ku wê kirine) şoreşger bi nav dikin. Kesên mîna Doğu Perinçek, tankan silav dikin, didin zanîn ku "artêşa wan a şoreşger rê nade şerîatxwazan." Dîsa sendikayên karkeran, digel patronan li dijî Partiya Refahê hevkarîyê dikin û pêkanîna biryarên MGK'ê dixwazin. Heta mirov dikare bibêje ku, gelek rêxistinên din, dev ji rojeva gel û pirsgrêkên kedkaran berdana, tiştên ku vê partiye avêtine holê nîqaş dikin. Bêdengiya li ser dagirkirina başûrê Kurdistanê û çewt-nirxandinên hin rêxistinên di ser tevgera kurd jî têkildarî bandora bîrdoza wê partiye ye.

Di dîroka Tirkîye û Kurdistanê de yekemîn car tevgera azadiyê rasterast li hemberî wê partiye dest bire xwe û hêzên çekdar ên kurd derbeyên mezin li otorîteya wê partiye xistin: Bi vê kirina xwe, tevgera kurd bû serkêş û avakarê bereyê demokrat û azadîxwaz. Lê mixabin hê jî hêzên dijber xwe bi giştî ji bandora bîrdoza Partiya Serkaniya Giştî rizgar nekirine û xwe nedane dor tevgera azadîxwaz.

Roja qiyametê nêzîk dibe

İBRAHİM XORT

Têkoşina Rizgariya Netewa Kurdistan di şerê xwe yê çekdarî de, li bakurê Kurdistanê dikeve sala 14'an. Di nav van salan de, kurdan gelekî zor û zehmetî dît û hê jî dibîne. Bi hezaran şehîd dan, bi hezaran kurd birîndar bûn, bi deh hezaran girtî hene û bi sed hezaran kurd cih û warên xwe terk kirine. Heya cihê ew tişt her normal in. Lewra "Dijminatî bêminetî ye". Çi ji kê bê wê li hemberî dijminê xwe bike. Lê ya ku mirov diêşîne na derba dijmin, derba biran e? Helbet mirov dikare bipirse: "Gelo bi rastî yên ku vê derbeyê li me kurdan dixin birayên me ne, an dijminê me ne?" Bersiva vê pirsê çiqasî zehmet e! Lê mixabin bersiva vê pirsê em bixwazin nexwazin li ber çavan e û nayê veşartin. Ma kîjan kurd dikare kurdekî welathez, ji Kurdistanê wî biqewirîne û kî dikare bi qatîlên kurdan re bibe yek û bi wan re derkeve nêçîra kurdan? Helbet bersiva vê pirsê jî yek e: "Dijminên kurdan."

Cihana ku tê xwestin li kurdan were tengkirin, vê carê jî bi destên kurdan tê xwestin ku hê tengtir bikin û kurdan tê de bifetisînin! Vê yekê jî kurd, di bin navê xwe xelaskirinê de, bi dijminên xwe re dikin. Ew nabînin ku her rojê bêhn li wan diçike, xwîn ji wan diçe û ber bi mirinê ve diçin. Jixwe, ma ne ev dîtinên kurdan e ku heya îro di destên dijminê xwe de bûne listok û negihîştine armanca xwe. Îro listika herî mezin a dîrokî li hemberî kurdan li başûrê Kurdistanê tê listin. Li hêlekê Tir-

kiye, Îsraîl û Amerîkâ û li hêlekê PDK! Bi bawerîya ku tîkiliyên wan û Tirkîyeyê xirab dibe, êrîşî ser partizanên kurdan dikin. Dibêjin ku ji ber çalakîyên PKK'ê em nikarin tîkiliyên xwe û Tirkîyeyê xirab bikin. Em bibêjin ev dîtina wan jî rast e! Ma gelo gunehê penaberên Kampa Ertrûşê çî bû ku PDK'ê her rojê êrîş dibir ser wan û ji wan dixwest ku li hemberê PKK'ê rahêjin çekan?! Tirkîye, ma ne di bin navê êrîşkirina PKK'ê de, gund û bajarên Başûr jî wêran dike? Ma hûn xwîna kurdên Bakur ku hê li ser paletên tankên wan û li ser topên wan zîwa nebûne û di kolanên we re derbas dibe jî nabînin? Korîti zehmet e...

Dîroka xayintîya kurdan ya li hemberî hev, ji Harpagûs dest pê dike... Rojekê qralê kurdan Astiyakes xewnekê dibîne, di xewna xwe de, keça xwe dibîne ku di bejna keça wî de, darek şîn dibe, Astiyakes vê xewna xwe bi hekîm û zaneyan dide şirovekirin. Li gorî van aliman, ew dar nebiyê Astiyakes e û tê gotin ku heger ew kes mezin bibe, wê Astiyakes ji qraltiya wî bixîne! Ji ber vê yekê Astiyakes ji tîrsa, keça xwe li şûna kurdan dide yekî farişî. Demek paşê jî keça wî re kurek çêdibe. Astiyakes dixwaze wî kurek jî bikuje. Ew fermanê dide Harpagûs (generalê Astiyakes e) ji bo ku wî kurek bibe bikuje. Ancax Harpagûs lawik dide şivanekî, ew şivan lawik dibe mala xwe û nakuje, wî xwedî dike. Astiyakes vê yekê dibihîze. Rojekê Harpagûs dawetî koşka xwe dike û goştê kurê Harpagûs dide Harpagûs. Harpagûs vê fêrî dîke ku goştê kurê xwe dixwe. Paşê

ew lawikê ku dabû şivan mezin dibe, Harpagûs û lawik (Keyxusrevê îranî yê navdar!) dibin yek û dewleta Medya hildiwêşînin. Li gorî dîrokzan Herodot, ev mîtolojiya ku di nav gel de tê gotin e. Lê belê di rastiya xwe de, Harpagûs ji bo ku desthilatdariyê bixe destê xwe, bi Keyxusrev re dibe yek û îxanetê li hember Astiyakes dike û împaratoriya Medya hildiwêşînin.

Îro jî Harpagûsên me yên modern (!) derdikevin pêşberî mîletê xwe. Ew ji qraliyeta xwe ditirsin, goştê zarokên kurdan bi kurdan didin xwarin û dixwazin serhiladan û berxwedana gel tîk bibin. Nabînin, ji ber ku xwîn ketiye çavên wan. Fêrî nêçîra jî ber ku mejiyê wan zeng girtiye û hurmeta wan ji kurdan re tune ye, ji ber ku ew êdî koleyên xwediyê xwe ne!

Dewleta tirk bi piştgirîya Îsraîl û Amerîkayê dîsa kete Başûrê Kurdistanê. Ev dagirkirin encama planeke navneteweyî ye. Ev hêzên navneteweyî dixwazin vê plana xwe pêk bînin.

Lê di hemû pirtûk û baweriyên pîroz de, behsa roja qiyametê tî kirin ku mirî vedijîn. Roja qiyameta kurdan jî hatiye! Kurd vedijîn û wê vê carê bigihîjin armanca xwe. Asteng û problem çî û kî dibin, bila bibin ew roj hatiye. Roja qiyametê ew e ku li ser rûyê erdê çî hebe, li ber Xwedê çok vedide û efîya xwe ji Xwedê dixwaze. Ji bo kurdan jî ew roj hatiye ku hemû gunehkar li hember gelê kurd çokê vedin û efîya xwe jê bixwazin; çî kurd çî biyan!...

DER barê dagirkirina başûrê Kurdistanê de Rojnameya Fransî 'Lê Mond'ê roja 21'ê gulanê nivîsek weşand. Di nivîsê de, tê diyarkirin ku, Tirkiye pirsgirêka kurdî dixwaze bi tenê bi awayekî leşkerî çareser bike, lê ev yek her ku diçe Tirkiyeyê ji Ewropayê dûr dixê. Di nivîsê de tê diyarkirin ku Tirkiye bi vê polîtîkayê nikare bi ser bikeve. Rojnameya navdar balê dikişîne ser têkiliyên Tirkiye û Îsraîlê jî û dide zanîn ku hevkarîya leşkerî a Tirkiyeyê û Îsraîlê, di serî de Suriye welatên cînarê Tirkiyeyê û welatên ereb aciz dike. Li gorî Le Mondê raya giştî ya Ewropayê nikare li hemberf wan operasyonên artêşa tirk ku her sal tekrar dibin bêdeng bimîne.



YEKÛTIYA Nivîskarên Kurdistanê ji sala 1997'an pê ve her sal dê di warê helbest, pexşen (kurteçîrak, roman) û lêkolînê de xelatan bide. Xelatên kevneşopî yê sala 1997'an li ser navê Osman Sebri dê di meha rezberê (îlonê) de bi merasimekê bigihên xelatgiran. Yê dixwazin beşdar bibin divê hela tîrmeha (temûz) 1997'an jî berhemên xwe yê bi zimanê kurdî, 5 nusheyên bişnin navnişana yekîtiyê. Hate ragihandin ku wê xelata kesê yekemîn 1000, xelata kesê duyemîn 500 û xelata kesê sêyemîn 250 DM. be. **Navnişan:** Yekîtiya Nivîskarên Kurdistanê
Finowstr. 27-HH 4. Etage 12045- BERLIN

NÛÇE

Cerdevanên ku ji qada şer vegeriyane:

Bi dehan leşker hatin kuştin

Li gorî agahiyan roja 18'ê mehê balafireke şer a F-104 li Zapê ji hêla gerîla ve hate derbekirin, ew balafir li pesara di navbera Çelê û Şirnexê de ket, du üstegmenên di vê balafirê de mirin. Ketina balafirê ji hêla cerdevanan ve jî hate selmandin.

Tevgera dagirkirinê ya artêşa tirk, du hefte li pey xwe hiştin. Li gorî daxuyaniya Serkaniya Giştî ya Artêşa tirk her roj bi sedan gerîla tene kuştin. Hejmarên ku ew didin, ji 2 hezarî derbas bûn. Heftiya çûyî Serkaniya Giştî bi helikopteran hinek rojnameger birin herêmê û çend girên ku bi dest xistine nişanî wan dan. Piştî vê yekê çapemeniya tirk digel van dimenan, destanên serkeftinê dinivîsin. Lê çapemeniya navneteweyî eleqe nişanî vê geşta bi firoke neda. Li gorî agahiyan hê jî çûyîna herêmê ji rojnamegeran re qedexa ye, generalên tirk fermana kuştina rojnamegerên ku bikevin herêma şer dane.

PDK'ya ku li Hewlêrê mirovên sivîl bi Lovitiyêke mezin kuştibûn, niha dixwaze vê kirinê jî stûyê xwe derxe. Li aliyekî rayedarên vê partiye dixwazin ku hevkarîya xwe ya bi artêşa tirk re veşêrin û reaksiyona raya giştî ya kurd

nerm bikin. Lewma jî ew didin zanîn ku wan artêşa tirk venexwendiyê herêmê. Li aliyê din li dijî PKK'ê şerê psikolojîk dimeşînin. Nûnerê PDK'ê yê Enqereyê Safîn Dizayî, PKK bi diktatoriye sûcdar kir û radyoya vê partiye jî, Serokê Giştî yê PKK'ê şiband Hitler. Li gorî Dizayî PKK'ê jî Başûr 3 hezar ciwan revandine. Dîsa nûnerê PDK'ê yê Londonê îdia kir ku wan zeviyên kendirê yê PKK'ê dftine. Digel van yekan jî rojnameyên tirk jî alîkariya PDK'ê nakin û kirinên wê wekî qetlîam bi nav dikin.

PDK nikare sûcê qetlîamê ji stûyê xwe derxe

Digel van hewlên PDK'ê jî, wisa xuya ye ku ev tevkujî wê di stûyê PDK'ê bimîne û cewawera kurd, wê tu çar ji ber vê kirina hovane PDK'ê efü neke. Ji niha ve gelê kurd vê yekê bi çalakiyên xwe nişan di-de û digel alên tirk, Amerika û Îsraîlê, maketên Mesûd Barzanî jî dişewitîne.

Şer li Bakur jî gur bû

Li gorî agahiyan ku ketine destê me şer û çalakiyên ku li başûr û bakurê Kurdistanê pêk hatine bi vî rengî ne:

Di roja dehan a tevgera dagirkirinê de li Çiyayê Bêxêrê di navbera hêzên dewleta tirk û gerîlayên ARGK'ê de şer derket. Di şer de 2 cerdevan mirin û 4 PDK'yî jî birîndar bûn. Li aliyê vî çiyayî ku li Cizîrê dinêre, di heman demê şer derket û leşkerek di şer de hate kuştin. Hate



gotin ku roja 23'yê mehê bi şeş ambûlansan birîndar anîne Amedê.

Gerîlayan roja 21'ê gulanê êriş birin ser birên neftê yê li nêzî Batmanê û sê bîr hatin rûxandin. Dîsa gerîlayan li Doğanşehira Meletiyê êriş birin ser avahiyan adliyeyê, di êrişê de notirvanê bi navê Necatî Yılmaz hate kuştin.

Li herêma di navbera Nisêbîn û Midyatê de roja 23'ê gulanê gerîlayan êriş birin ser yekîneyeke tîmên taybet, di vê êrişê de tîmek hate kuştin, 3 tîm jî birîndar bûn. Dîsa gerîlayan di 24'ê gulanê de avêtin ser Kızılsuya Dergola Şirnexê, di şer de 6 cerdevan û 5 leşkerên ku pêli mayînan kirin, hatin kuştin. Hate ragihandin ku gerîlayan 8 cerdevan jî bi xwe re birine. Li Mergasora Xaxurkê roja 24'ê gulanê di navbera gerîla û hêzên PDK'ê de şer derket, di şer de pêşmergeyek hate kuştin. Her wiha li herêmên Mergasor, Sersing û Avaşîn 2 pêşmerge û cerdevanekî pêli mayîna gerîla kirin û mirin.

Roja 26'ê gulanê hêzên ARGK'ê êrişî ser leşker û cerdevanên di navbera gundên Ertoş û Bîrêya Çelê kirin. Di vê bûyerê de bi navê Arif Serdar û Mehmet Hazayî du cerdevan mirin, 9 cerdevan birîndar û 7 heb jî winda bûn. Li aliyê din hate diyarkirin ku cendekê 11 leşkerên ku di şer de mirine, anîne Nex-

weşxaneya Dewletê ya Culemergê.

Dîsa li dora Newala Giyanê û Malêsor a Sasonê gerîlayan êriş birin ser cerdevanan. Di vê bûyerê de 3 cerdevan bi xedarî birîndar bûn. Li herêma Qulpê konvoyeke leşkerî ket kemîna gerîla, li vir 3 leşker mirin û 2 leşker birîndar bûn. Li aliyê din piştî ku li Çiyayê Mazî gerîlayan roja 24'ê mehê du cerdevan revandin, hêzên dewletê dest bi operasyonê kirin. Di şerê ku roja 26'ê mehê derket de leşkerek mir û 3 leşker jî birîndar bûn.

Li Zapê F-104'ek hate xistin

Li gorî agahiyan roja 18'ê mehê balafireke şer a F-104 li Zapê ji hêla gerîla ve hate derbekirin, ew balafir li pesara di navbera Çelê û Şirnexê de ket, du üstegmenên di vê balafirê de mirin. Ketina balafirê ji hêla cerdevanan ve jî hate selmandin. Hejmara cerdevanên ku ji Başûr bêtî destûra artêşa tirk vegeriyayan gihîşt 200'î. Tê gotin ku fermanarên tirk dest danîne ser çekên wan kesan û der barê wan kesan de wê doz bê vekirin. Li aliyê din van cerdevanan da zanîn ku wan bi çavên xwe dîtine ku bi dehan leşker hatine kuştin. Li gorî gotina wan, şer bi piranî bi şev û piştî kemîn û êrişên gerîlayan erketine.

NAVENDA NÛÇEYAN



Parçebûna Kurdistanê û Kurdên Başûrê Biçûk

Egera herî mezin di parçebûna Kurdistanê de listibû. Ew, cihê wê yê jeq-siyasî pêwist bû. Ji ber ku welatek xwedî bînerd û sererdeki dewlemend e, diyan cihê wê yê girîng li ser riya bazirganiya kevn di navbera rojhilat û rojava de û ji bo van sedeman şerekî mezin di navbera Şah Îsmailê Sefewî û Sultan Selîmê Osmanî de qewimî. Ew şer bi navê Çeldêran di 23.8.1514'an de derket. Ew di dîroka gelê kurd de xaleke mezin bû. Bandora vî şerî li ser gelê kurd giran hat. Çima? Ew bû sedem ku yekemîn car Kurdistan bû du perçe. Kurdistan, ya ku ji 46 mîrmîşînên kurdan pêk dihat.

Piştî vî şerî, parçebûna Kurdistanê û danîna sînoran di navbera her du împaratoriyan de hat çespendin bi riya peymanana Qesre Şêrîn a di 1639'an de, ku Şahê Îranê Şah Abas û Sultan Murad Osmanî îmze û mor kirin.

Li dawiya şerê cihanê yê yekemîn, yê ku Osmanî ketibû şer û bibû pişt-benda Almanayê. Her du dewlet di encama vî şerî de têk çûn û şikestin. Ev şikestina han hişt ku jiyana nexweşiya Împaratoriya Osmanî û temenê wê kurt bibe û bê xwarê û hilweşe. Lê berî ku şer bigihê dawî, dewletên hevberd yê li dijî Almanayê bûn, peymanek nehênî di nav xwe de pêk anîn, ev peyman bi navê /Saykis- Biko di sala 1916'an de hatibû îmzekirin, tê de wan dewletên bi serketî Rûsya, Fransa- Britanya her yek para xwe ji erdê fireh yê Împaratoriya Osmanî veqetand û her dewletekê navê rengekî li wê erda (herêma xwe) ku veqetandibû (mîna herêma sor, zer, şîn û herêma A, B bi vî hawî) kirin. Piştî şer civînek mezin li Îtalyayê li dar xistin. Ew civîn bi navê Kongresa San Rizo di mêjûya 19.4.1920'an de pêk hat. Di vî civînê de parçebûna herêma Rojhilata Navîn û di hundirê wê de jî parçebûna Kurdistanê careke din hate holê. Çawa? Ji ber ku di vî civînê de tiştên bincil diyar bûn, peymanana sala 1916'an a bi navê Saykis-Biko hate eşkerekirin. Kesên beşdar di vî civînê de razîbûna wan li ser çarçoveya dawî ji peymanana aştiyê û lihevhatinê bi Tirkîyeyê dane qebulkirin. Li Fransa-Sevrê di 10.8.1920'an de peymanek hate îmzekirin û ji encamên vî peymanê gelek kelexên siyasî-nîjadî derketin holê. Careke din parçebûn bû para Kurdistanê, Kurdistanê bû çar perçe û mijara me ew perçe yê ku ketibû bindestê Fransayê ye.

Di navbera Fransa û Tirkîyeyê de ji bo bicihkirina sînoran xetek girîng pêk anîn. Ew xet bi navê "Türk Fasil" bû û tê de başûrê xeta Meydan Ekbe, Kilis, Çoban Beg, riya hesinî ya Bexdad- Nisêbînê û riya bejî ya kevan a Nisêbîn- Botanê di bin destê Fransayê mabû.

Fransayê di wê demê de Sûriye û Kurdistanê dagir kiribû. Para Fransayê ji Kurdistanê ne biçûk bû. Lê piştî dan û standinên dûr û dirêj û duriya gelek peymanan û ya herî pêwist Lozan, êdî hêdî hêdî mêtîngeriya Fransayê destên xwe ji herêma şîn, yanî bakurê xeta Kilis, Birecik, Mêrdîn, Botan vekîsand û xiste bin destê dewleta tirk ya ku nû ava bûbû. Piştê gelek lihevhatin û peyman di navbera Fransa û Tirkîyeyê de çêbûn ji bo bicihkirina sînoran mîna peymanana mêjûya 20.10.1921 û protokolên 22.6.1929 û 3.5.1930 xetek girîng pêk anîn. Ew xet

û li dîv vekîşina artêşa Fransayê ji Kurdistanê û ji Suriyeyê li dawiya salê çilî, ku ev vekîşin bi xwîna sedan xort û ciwanên kurdan û ereb bûye. Serxwebûna vî parçeyê biçûk ji Kurdistanê ku îro li ser wê bazar tînin kirin ku hin dibêjin Kurdistan li Sûriyê nîn e û hin dibêjin doza çend gundan e.

Ev herêm ji sê deveran pêk tê.

1- Devera yekemîn Cizîr e. Di navbera çemê Dîjle û rexê rojava yê Çemê Xabûrê de ye, nêzîkî 250 km. dirêjayî, 30 km. panayî.

2- Devera duyemîn herêma derdora Çemê Feratê, nêzîkî 60 km. dirêjayî, 40



km panayî. bi navê "Türk Fasil" bû û tê de başûrê xeta Meydan Ekbe, Kilis, Çoban Beg, Riya Hesinî ya Bexdad- Nisêbînê û Riya Bejî ya Kevan a Nisêbîn- Botanê di bin destê Fransayê de mabû û di wê demê de dewleta Suriyê ya ku ava bûbû, ev dewleta nû ya ku di bin serperîştîya Fransayê de bû, ji bo ku aqarê xwe fireh bike û perçeyên din ji Kurdistanê ji wilayeta Musil- Dêrdorê Qerçokdağ, rojhilatê Cizîrê, destpêka Çiyayên Şengalê, xiste bin lepê xwe.

Dagirkerên ku ev plan çêkirin, hîç nekirin hişê xwe ku miletek li ser xaka herêmê bi sedan sal e dijî, qet li pêşeroja vî miletî nefikirin û girîngî nedan beşdarbûna vî miletê di vî planê de. Bi vî hawî Fransayê herêmek mezin ji Kurdistanê diyarî dewleta Suriyeyê kir

km panayî.

3- Devera sêyemîn, herêma ji rojhilata Kobanê -Sirûcê- Afrîn (Kurdx) deşta Antakya ta qêraxa Derya Spî nêzîkî 40 km. dirêjahiya.

Rewşa gelê kurd li serdema Fransa ji aliyê siyasî, civakî, aborî û çandî ve baş bû. Lê xerabiya wan jî hebû. Vê serdema baş di wexta dewleta Suriyê de dewam nekir û yekbûyî desthilatdarî kete destê hikûmeteke cûdaxwaz. Lê dema Partiya Baas hat, desthilatdarî xiste destê xwe di 8.3.1963'an de û pişt re bi derbeyeke leşkerî rejîma Al-Asad di 19.11.1970'yî de hat û hikûmeteke leşkerî ya alewî ava kir û bi sersiya zagona ahkamê înfî kar û barê dewletê ta roja îro tê meşandin û roj bi roj rewşa gelê kurd lawaz û xerabtir di-

be. Ji ber ku ew rejîm gelek plan û siyasîyên şoven der heqê gelê kurd dimeşîne:

1- Siyaseta herî mezin qanûna ser Jimêra Awarteyî ku di 5.10.1962'yan de pêk hatibû û ji encamên wê bêparbûna 150.000 kurdî ji mafê welatiya Suriyê. Dewleta Suriyê bi vî qanûnê xwest ku kurdan mîna penaberan û mîna cîran yên ku ji Kurdistanê bakur û başûr cih û warên xwe berdane û li Suriyê mîna mêvanan ciwar bûne, bide xuyakirin.

2- Siyaseta kembere erebî û valakirina gund û bajarên kurdan û di şûna wan de niştecihkirina erebên koçber da ku demografiya Kurdistanê Sûriyeyê bête guhartin.

3- Erekkirina dever û herêmên Kurdistanê û guhartina navên gund û bajarên Kurdistanê û bi navên mîna; Al-Arûba, Yaîrûbiyê, Qehtaniyê.

4- Rejîm şerekî eşkere dimeşîne, li dijî her tiştî girêdayî çand, ziman, hunera kurdî.

5- Siyaseta jibîrkirin û îhmalkirina Kurdistanê Suriyeyê ji aliyê projeyên pêşxistina aborî, civakî, çandî ve.

6- Şerekî qirêjî li dijî rêxistinên tevgera rizgarîxwaz a Kurdistanê Suriyê û derxistina kelem û astengiyên di riya pêşketina gelê kurd de li Suriyeyê.

7- Siyaseta girtina neqanûnî ya ku qanûna Ahkamê îrfî rê dide dezgehên istixbareta Suriyê ku têkoşer û xebatkarên kurd bêne girtin û bê mehkeme wan têxin zindanê.

Ji ber vî rewşa siyasî ya xerab a ku gelê kurd tê de dijî û ji ber tunebûna mafên demokrasî û azadiya peyv û raman û derbirin û binpêkiina mafên insanî û ji ber rêxistinên kurdî li Suriyê nedikarin bi şeweyekî meram û daxwazên gel di riya dem û dezgehên demokratîk de mîna parlamenê bi destxwe bixînin. Lewre jî şewe û awayên xebata siyasî li Suriyê qedexeye û mînakê herî biçûk meşa Newroza sala 1986'an bû li hemberî koşke serokomar H. Al-Asad, ew meş, meşeke siruştî û aştiyane bû û bi armanca serbestkirina pîrozkirina Newrozê bû. Lê meşa aştiyane gulebaran kirin û kevoka aştiyê bi xwîna şehîdekî kurd û dehan xortên birîndar hat avdan. Ji ber hovîtî û barbariya vî rejîmê, ev demek dirêj e ku hêz û rêxistinên kurdên Suriyeyê yên ku li Ewropa bi cih bûne, xebat û çalakiyên xwe li welatên penaberiyê dikin û çalakiyên herî girîng di vî dawiyê de,

ew meşa aşî û demokrasîyê li hember Balyozxaneyê Sûriyeyê, li Bonnê di mêjuya 19.4.1997'an de pêk hat. Meş di bin serperîştîya rêxistinên Ewropayê yê Hevbendîya Demokrasiya Kurdî li Sûriyeyê bû. Meşvan, li Walter Flex str, Eske Adenaveralle 'Kunstmuseum' li bajarê Bonn kom bûn. Meşê bi çêşeke mezin bi alên rengîn û wêneyên şehîdên tevgerê û bi avêtina sloganan dest pê kir. Meşvanan hêdî hêdî digel parastina polîsên alman berê xwe dabûn balyozxanê. Axaftineke bi zimanê almanî çêbû, tê de rewşa gelê kurd anin ziman; rewşa gelê ku di bin zilm û zora rejîma Baas de dinaliya, şîrove kir û diyar kir ku çend plan û siyasatên şoven û nijadperest li dijî gelê kurd ne tenê li Kurdistanê Sûriyeyê, lê li parçeyên din jî, nemaze li başûr û bakurê Kurdistanê tê meşandin. Pişt re jî du axaftin bi zimanê kurdî û erebî çêbûn û di her sê axaftinan de tevgera rizgarîxwaza kurdî û li Sûriyeyê siyasatên dewletê yê li dijî kurdan protesto kirin û armanc û daxwazên gelê kurd diyar kirin û bang li hemû rêxistinên siyasî yê fermî û gelêrî li Ewropa û cîhanê kirin ku bala xwe bidin rewşa gelê kurd û piştgiriyê bidin mafê wan yê rewa.

Armanç û daxwazên tevgera rizgarîxwaza kurdî li Sûriyeyê di van xalan de derbas dibûn:

1- Îtîrafê hikûmeta Sûriyeyê û bi şeweyekî fermî, destûrî bi hebûna gelê

kurd mîna neteweyê duyemîn li Sûriyeyê û temamî û cîhana mafên wan nîjadî yê siyasî, civakî, çandî.

2- Berdan û serbestkirina maf û azadiyên demokrasî û rêlibergirtina mafên însanan û çareserkirina doza kurdî li Sûriyeyê di riya hevpeyvîneke birayeyî û li ser bingehê wekhevî û demokrasî.

3- Rakirin û nehiştina siyaseta kembere erebî û rawestandina zagona serjimêra awarte û encamên wî digel rakirina zagona Ahkamê irfî.

4- Berdan û serbestkirina hemû girtiyên siyasî li welat û bi taybetî hebsî û girtiyên siyasî yê tevgera kurdî.

5- Nehêlan û vekîşandina biryara standina mal û milkên kurdan ên ku ji mafê welatîyê bêpar, ên ku hukûmeta Baas, der heqê mîletê kurd de dimeşîne.

7- Rawestandina siyasatên şoven a ku bêşûc û sedem xwendekarên kurd ji dibistanê tene derxistin, karker ji kar-



xaneyan tene avêtin, karmend ji dam û dezgehên fermî li Kurdistanê tene derxistin, destdanîne ser erd û zeviyên cotkarên kurdan.

8- Îtîrafê dewleta Suriyê bi zimanê kurdî mîna zimanekî fermî yê duyemîn li Suriyeyê û serbestkirina xwendin û nivîsandina li deverên Kurdistanê.


Birpirsiyarên meşê ev armanc û daxwazên gelê kurd xistin nava nameyêke protestoyî û bi alîkariya serokê polîsan û çend polîsên din, berê xwe dane dergehên Balyozxanê û xwsetin ku hevdî-

tinekê digel berpirsiyarên balyozxaneyê çêbikin û nameyê bidin wan. Lê mixabin tu kes ji wan nehate der û qebûl nekirin ku digel berpirsên meşê biaxivin, lê belê ev nebes bû. Wan bersivên xwe ji dûr ve dan û gotin ku Kurdistan li Suriyeyê nîn e.. Li Sûriyeyê pîrsa kurdî nîn e.. Kurdên Suriyê mêvan û penaber in.. Bi van gotinan hukûmeta Baas rûyê xwe yê reş û şoven careke din nîşanî raya giştî ya Ewropayê û cîhanê da.

FENÊR ROJBIYANÎ

Bavê Hesen û diya Metîn

OSMAN ÖZÇELİK



Bavê Hesen bi solên xwe yê bêbonyax li ser xalçeya salona Otêla "Hyatt" a bi pênc stêrk, bi pêjna dîzan, hêdî hêdî meşîya. Berî ku rabe bimeşe, şewqeya xwe dabû jina xwe ya li kêlekê rûniştî. Ev mîrikê hûrik, simbêl tûjik, por weşiyayî ber bi mîkrofonê dimeşîya. Em li salona konferansê bûn. Beşdarên civînê nas bûn. Belê otêla pênc stêrk nenas û biyan bû. Em vexwendiyên Claudia Roth bûn. Êdî Claudia, li derdora me qenc tê naskirin. Dosta kurdan, parlamentera partiya 'Kesk a Almanyayê, berpirsaya Keskên Parlamentoya Ewropayê. Claudia li ser mafya û çeteyan civînek li dar xistibû. Ji Îtalya, Fransa, Belçîka û hwd. mirov hatibûn. Qala pirsgirêka mafya û çareserkirinê dikirin. Bi xwezayî ji Tirkiyeyê jî siyasatvan, rewşenbîr, rojnamevan hebûn. Li ser pirsgirêka çeteyan hûr û kûr; dûr û dirêj rawestiyân.

Di dawîya civînê de, bavê Hesen jî xwestibû bixavê. Bi gavên biçûk û bi çokên lertzok dimeşîya. Mikrofon bilind bû. Devê wî nedigihîştê. Bi destan mîkrofon tewand, nizm kir. Dest bi axaftinê kir. Mirov ku qenc bala xwe neda axaftinê fêm nedikir ku bi çi-

zimanî ye. Bi kurdî an bi tirkî. Ji xwe du-sê deqîqe derbas nebû, camêr dest bi girî kir. Erê li ber mîkrofonê hîske hîska wî bû, hêstir dibarandin. Ji girî nikarî tu tişt bigota. Tenê hat fêmkirin ku bi tirkî diaxive û dibêje kuşî min jî hat kuştin.

Ew bavê Hasan Ocak bû. Di 12'ê îlona 1995'an de, Hasan Ocak wînda bûbû, paşê laşê wî li daristana Beykozê hat dîtin. Hasan Ocak mixalîf bû. Ew roj, ev roj malbata Hasan Ocak bi dû wî ketine.

Em werin ser pîrsa diya Metin. Ew niha di "Klîp" a Ferhat Tunç de dixuye. Belê we nas kir. Diya Metin Göktepe. Tu civîn namînin ku ew ne li wir e. Feqîra belengaz, bê zar û ziman. Ji axaftina wê ne tirk û ne jî kurd fêm dikin. Pîr e, navsere ye û di ser de jî bawî ye.

Metin rojnamevanekî ciwan bû. Nûçevanê rojnameyek biçûk a çep bû. Kûçe bi kûçe kolan bi kolan li dû çalakî û nûçeyên çepan bû. Rojekê hat binçavkirin. Berdevkê dewletê jî yê wî re digotin: "Ev ne rojnamevan in, ev milîtan in!" Bi rastî jî Metin, milîtanekî rêxistînek çepgir bû. Dewletê li ku keys bi mixalîfan dixist, an diavêt zindanan an jî, lédixist ew dikuştin. Li Metin xistin. Metin di nav lepên polîsan de can da. Metin kuştin. Cendekê wî avêtin derve.

Ev her du xort jî kurd bûn. Kurdên alewî. Belê nasnameya wan a neteweyî li ser milê wan bûbû barekî giran. Ji nasnameya xwe ya neteweyî direviyân. Kurdbûn û kurdayetî nijadperestî bû. Nijadperestîya Türkes û weltaparêziya Kurdistanîyê mîna hev in. Xelasi di şoreşê de ye. Şoreşa proleterîya.

Belê, çi bi zaneyî û çi bi nezanî li ser navê şoreşa proleterîya (ku bi piranî kemalîzma veşartî ye) dijminatîya kurdayetiyê bê kirin jî, mirov mixalîf be, ji êrişên dewletê xelas nabe. Ev dewleta ku li ser xwînê ava bûye, mîna vampîran bi mijandina xwînê li ser piyan dimîne.

Çapemeniya tirk, bi dû doza Hasan û Metin ketiye. Metin kirin sembola azadiya çapemeniyê. Diya Metin û bavê Hasan ji kanaleke televîzyonê diçin yek a din. Ji radyoyekê dibezin rojnameyekê û ji wir diçin konferansan, civînan. Li her derê, wêneyên Hasan û Metin hene. Dê û bavê Hasan û Metin didin axaftin. Wijdanê raya giştî pê tamin dibe. Dewlet şaşî û çewtîyan nake. Wan hay jî xwe tune. Nizanin çi diqewime.

Ma ku wan bizanibûya çi diqewime; wan ê nizanibûya Metin, ne rojnamevanê herî girîng e. Çima kes qala Musa Anterê ka, Hüseyin Deniz, Hafız Akdemir nake. Ma qey ew kêmi Metin bûn? Ma ku bavê Hasan bizanibûya ew kirine çi govendê, wê negota lawo ma bi hezaran xortên kurdan hatin kuştin, çima tu kes qala wan nake?

Û bavê Hasan hay jî xwe hebûya, wî yê nizanibûya qetlîama Meraşê, ya Sêwazê û ya Gaziyê di dewra sosyal demokratê sexte de qewimiyê. Û ger wî bi van zanibûya, piştî axaftina xwe ya kurt a bi girî ya li otêla pênc stêrk, bi çavên xwe yê şil xwe li Ercan Karakaşê mebusê CHP'ê digirt û bi mirçîn ew maç dikir?

Şervan di şer de xurt dibin

A. SERDAR DERYA

Li rastê derbeyeke xedar nîn e. Bi tenê mirov kare qala "Serketina Pîrûs" bike. Bi gotineke din artêşa tirk xwest ku ji baranê bireve, lê rastî bahozê hat.

Gerîla bi tevahî ji Zapê venekîşiyane û Zap ji çar alî ve ji hêla gerîla ve hatiye dorpeçkirin. Bila artêşa tirk qet meraq neke. Di rojên pêşiya me de gerîla wê hêza xwe nîşanî hêzên tirk bidin! Wekî tê zanîn 'gerîla li her derê ne, lê li cihekî namînin' ku pêwîst be, ew dikarin cihekî ku tê de herî xurt in jî biterikînin. Lê ew her dem dikarin wî cihî bi dest bixin.

Qala kuştina hezar kesî dikin! Bi tenê sê term nîşan dan. Ji van du kes birîndar bûn, kesên birîndar dikujin, wekî term nîşan didin, hew...! Lê, ev jî ji bo van zêde ye! Ji ber ku hêz û îmkânên hebûn, dikaribûn pêşiya vê yekê bigirtana. Digel ew qas xeletiyên taktîkî jî, gerîla ev operasyon a ku di dîroka wan de ya herî mezin e, kilid kirin. Artêşa tirk ket nava avzêleke (bataklik) kûr. Xuya ye ku, di qada navneteweyî de jî her diçe dikevin tengasiyê.

PDK'ya ku artêşa tirk dawet kiriye piştî du hefteyan radibe dibêje 'me ew dawet nekirine.' Ev kesên qeşmer û xayin ku nema mirov dikare jê re bibêje partî, bi salan bi piştigiriya dijminên gelê kurd, ev gelê bindest perçiqand û şoresgerên kurd bi xayintî kuştin. Em vê helwestê ji bir nakin û hesabê vê yekê wê li wan giran rûne.

Ger şervanên ARGK'ê ji dehi yek hêzen xwe jî li dijî PDK'ê bi kar binin, dikarin wê li serê KT bikin bela. Di rojên pêşiya me de dibe ku, KT ji bo ku herêma PDK'ê biparêze li Başûr qereqolan ava bike. Daxwaza me ew e ku, bila vê

Her wiha her çiqas baş ne zelal be jî, mirov dikare qala hevalbendiyê nehenî ya Iraq, PDK û Tirkiyeyê jî bike. Ji ber ku ji hevalbendiyê wisa, wê ev her sê dewlet sîdê wergirin. Hin nîşanên vê yekê hene. Lê, hem bi DYA'yê re û hem jî bi Iraqê re hevalbendî li hev nake.

yekê pêk binin. Ji ber ku bi vê yekê wê lêçûyînên (mesrefê) wan zêde bibin.

Artêşa tirk di dîroka komarê de zara qûmera herî mezin avêt û dibêje 'min du şeş' avêtiye, lê dibe ku cara duyemîn yek biavêje.

Bi tesadûfî 30 gerîlayan jiyana xwe winda kirine. Dibêjin me dora gerîla girtiye. Ew bi xwe di bin dagirkirina gerîla de ne. Ji ber ku kozikan çêdikin, bi tîlan dora xwe dipêçin û bi tanqan diparêzin. Ji Çemê Didayê bigir heya Çiyayên Zagrosan xurtbûna gerîla li ber çavan e.

Her wiha bi dîtina me, ev operasyon jî bo şervanan derman e û avdana pola ye; ji ber ku bi vê dagirkirinê hêzên gerîla sistî ji ser xwe avêtin û hişyarttir bûn. Bi kurtayî tiştê ku pêwîstiya me pê hebû, hate peyda kirin.

Diyar e ku, ketina Başûr hêsan e, lê derketin gelekî dijwar e. Ku ji bo demeke dirêj bimîne digel DYA'yê hemû cîhan, wê li dijî vê yekê derkevin. Lê, ku hema derkeve ev jî nabe. Ji ber vê yekê dixwazin di demeke kurtirîn de xwe bigihînin encamekê. Lê belê, bi vî awayî bi serketin pir zor e. Ji bo vê yekê şer hat qonaxa ku me hêvî dikir. Piştî vê yekê mirov dikare eniya Bakur û Başûr xurt bike, hin hevalbendên dijmin tasfiye bike, li Rojhilata Navîn hevalbendên nû peyda bike û kêşeya kurd navneteweyî bike. Ji her alî ve ji bo rizgariya neteweyî pêşiya tevgera kurd vedibe.

Divê PDK baş bê nasîn. Jixwe bi tevkujiya Hewlêrê hovitiya vê partiyê diyar bû. Hêviya van ew bû ku, PKK di nav

hefteya yekemîn de têk biçê û piştî vê yekê wê êrişî wê bikirana. Lê, piştî ku dîtin gerîla têk naçe, qala 'me artêşa tirk dawet nekir'ê kirin. Ji gerîla lêdan xwarin û ji ber wan direvin. Ev nayê wê maneyê ku ne şerxwaz in. Ji nişka ve pê hesiyar ku, xelet tevgeriyane.

Her wiha her çiqas baş ne zelal be jî, mirov dikare qala hevalbendiyê nehenî ya Iraq, PDK û Tirkiyeyê jî bike. Ji ber ku ji hevalbendiyê wisa, wê ev her sê dewlet sîdê wergirin. Hin nîşanên vê yekê hene. Lê, hem bi DYA'yê re û hem jî bi Iraqê re hevalbendî li hev nake. Wisa dixuye ku Tirkiye dixwaze di demeke kurt de vê hevalbendiyê nehenî pêk bîne.

Bi rewşa dawî PDK nikare politîkayan bimeşîne. Qasidên xwe dişîne paytextên wekî Bexda, Şam, Tahrân û Enqereyê ku li hev nakin. Niha herî baş bi KT'ê re li hev dikin. Lê, Tirkiye jî niha xeman dixwe. 'Me ev bela çawa dît' PDK dibe ku nêzikî me be jî. Ev jî mîmkûn e. Lê, divê bizanibin wekî Talabani ji Hewlêrê derxistin, nikarin PKK'ê ji Behdînanê derxin. Ev ne gengaz e.

Piştî ku rêveberên PDK'ya Tirkiyeyê ji aliyê Barzanî ve hatin kuştin, Ş.Elçî bi daxwaza Tirkiye û DYA'yê bû sekreterê PDKê. Niha jî di dema vê operasyonê de li Ewropayê digere, berdevkiya wan hêzan dike. Ev yek bi daxwaza DYA'yê pêk hat.

Dîsa em ji Barzanî re dibêjin, ger tu ji bo kurdan tiştêkî bikî, PKK'yî di bin fermana te de ne! Ku wisa bibe di navbera wê û PKK'ê de mesele dernekevin. Her

wiha ji bo PKK'ê li Başûr mayîn an jî çûyîn ne xem e. Kes nikare bêje Başûr û Bakur cuda ye û tu nikarî li vir bimîni. Ev sînoren derewîn in. Çawa ku Qazî Mihemed ji hemû parçeyan gazî kurdan kir û Mele Mistefa Barzanî jî kir wezîrê berevaniyê, divê tu jî wisa bikî. Helwesta baş û durist ev e.

Divê hemû rêxistinên kurdan jî êdî helwesta xwe diyar bikin. Partiya ku bi salan piştigiriya we kir, ji her alî ve diyar bû ku partiyeke çawa ye. Bila kes nebêje PKK ji bo çî li vir dimîne, PKK ji bo alîkariya we li vir dimîne. Ji ber ku pêwîstiya we bi birayên we yên bakurî heye.

Ji çepgirên tirk re dibêjim, îro hêzen paşverû yên tirkan piştigiriya hêzên paşverû yên kurdan dikin. Baş e, ma hûn bi qasî ku piştigiriya artêşa tirk dikin, piştigiriya hezên gelê kurd dikin? Bi taybetî ji hin der û doran re dibêjim 'Hûn çepgir in an jî ajan in? Diyar e ku ev artêş, ji bo paşverûyên kurd jî şer dike. Lê hûn ji bo çima li dijî tevgera kurd propagandayê dikin.

Li ser dawiya şer jî, mirov dikare wiha bibêje, wê şer ji berê gurtir bibe û ji her alî ve amadehî pêk hatine.

Artêşa kurd dixwaze kurdên xwe bi-xapîne û bi vî awayî kêşeya kurd çareser bike. Ji ber vê yekê di nav HADEP'ê de jî dixwazin hin kesan bikişînin aliyê xwe. Xuyaye nêzîktêdayîna artêşa tirk a ji bo kêşeya kurd wê nermtir bibe: Tevgera kurd dixwaze bi avakirina hukûmeta nû hin gavan biavêje.

Jixwe gava mirov bala xwe bide, wê were dîtin ku guherîna hukûmetan girêdayî şerê li dijî têkoşîna rizgariya neteweyî ye. Lê, kes nikare bêyî PKK'ê kêşeya kurdan çareser bike.

Ji bo temaşevanên MED-TV'yê Anket

Cihê ku hûn lê rûdinin

Karê we

- Karker
- Karmend
- Esnaf
- Xwendekar
- Cotkar
- Serbest

Zimanê we vê zikmakî

Hûn kîjan zaravayên kurdî dizanin?

MED-TV çî tîne bira we?

Hûn ji kengê ve li MED-TV temase dikin?

- 2 sal
- salek
- 2-3 meh

Wekî tê zanîn televîzyona kurdî, MED-TV'yê 2 saliya xwe qedand û kete sê saliya xwe. Di gel hemû astengiyên dagirkeran, ev televîzyona ku wekî "Televîzyona gelê bédewlet" tê binavkirin, weşana xwe didomîne. Em dixwazin bi vê anketê bizanin ku gelê me, bi çî çavî li televîzyonê dinêre û weşanên wê çawa dinirxîne. Em ji hemû xwendevanên xwe dixwazin ku vê anketê dagirin û ji me re bişînin. Emê piştî ku encam gihîştin destê me, bersivên we binirxînin û di rojnameyê de biweşînin.

Hûn li ku li MED-TV'yê temase dikin?

- Li mal
- Li cihekî din

Hûn her roj li MED-TV temase dikin?

- Erê
- Na

Li mala we cend kes li televîzyona kurdî temase dikin?

Li derdora we di cend malan de MED-TV heye?

Navê 6 bernameyan li gorî rêza jê hezkirina xwe binivîsin.

- 1).....
- 2).....
- 3).....
- 4).....
- 5).....
- 6).....

Hûn zimanê kîjan bernameyan hêsan û baş dibînin?

Hûn zimanê nûçeyan cawa dibînin?

- Hêsan e
- Giran e
- Jê fêr nakim

Baş e

Bi dîtina we bernameyên li ser kîjan mijaran pêwîst in?

Ji ber MED-TV'yê we tu tade dîtiye?

Rola MED-TV'yê di pêkanîna yekîtiya neteweyî û çareserîya pirsgerêka kurdî de çî ye?

Li gorî we pirsgerêka kurdî cawa çareser dibe?

Hûn ji bill MED-TV li kîjan kanalên temase dikin?

Hûn kîjan weşanan dixwînin?



- **1.06.1960:** 485 giregirên kurd ji hêla dewleta tirk ve hatin girtin û ew li Sêwazê kirin kampekê.
- **2.06.1994:** Ronakbîrê kurd, serokê DEP'ê yê Ruhayê Muhsin Melik, li navenad Ruhayê tevî hevalê xwe Mehmet Ayyıldız ji hêla kontrayan ve hate kuştin.
- **2.06.1991:** Helbestvanê mezin Ahmed Arif di 65 saliya xwe de li Stenbolê çû ser dilovîna xwe. Ahmed Arif li Diyarbekirê hatiye dinê. Hê dema ku li Enqereyê di Fakulteya Ziman, Tarîx û Coğrafya de şagirt bû, ji ber bîr û baweriyên xwe yê siyasî du caran dikeve hepsê. Ji ber vê yekê xwendina xwe nîvco dihêle; di hin rojnameyan de dixebite. Helbestên wî di kovar û rojnameyên cur bi cur de têne weşandin. Arif tevahiya helbestên

- xwe di pirtûka "Hasretinden Prangalar Eskittim (Min ji hesta te qeyd kevn kirin)" de gihand ser hev.
- **2.06.1964:** Rêxistina Rizgariya Filistinê (RRF) hate damezrandin.
- **3.06.1963:** Şair Nazim Hikmet çû ser dilovîna xwe.
- **4.06.1994:** Piştî daxuyaniya Serokwezîra demê Tansu Çillerê ya der barê karsazên kurd de, Savaş Buldan, Adnan Yıldırım û Hacı Karay hatin qetilkirin.
- **6.06.1913:** Kovara "Rojî Kurd" dest bi weşanê kir.
- **7.06.1991:** Partiya Keda Gel (HEP) hate damezrandin.
- **7.06.1992:** Nûçevanê Rojnameya Yenî Ülke û Özgür Gündemê Hafız Akdemir, ji hêla hêzên tarî ve li Amedê hate kuştin.

AWIR

Bi sebir, adîl û bijarte bû



Muhsin Melik û pîreka wî Senay

“**D**ema rêheval Muhsin Melik şehîd xistin, ez di girtîgehê de bûm. Beriya girtîgehê me bi hev re 4 salan xebata siyasî kiribû. Hevalê Muhsin her dem wiha digot: ‘Divê em tu car xwe ji xweşikbûna têkoşîna Rizgariya Neteweya Kurdistanê mehrûm nekin.’ Ew evîndarê azadiyê û têkoşerê gelê kurd bû. Li herêma, di cenazeyên gerilayan de her dem pêşengiya gel dikir. Cara dawî di cenazeyê Heval Mehmet Şen de wiha gotibû: ‘Ala wî em hildigirin, ji bo wî gelî em divê berendamê mirinê bin û em amade ne jî.’ Di jiyana xwe ya siyasî de heta dawiyê vekiribû, sadiqê doza xwe bû, emê heta dawiyê rîya wî bişopinin.” Belê piştî şehadeta Muhsin Melik, bi 2 salan wiha digot Eyüp Karageçi. Gelek tişt ji bo wî hatin gotin. Hin kesan digot: “Divê peykerê wî (heykel) li navenda Ruhayê were çêkirin.” Li gorî hinekan kekê Muhsin “Mîna Eyüp bi sebir, mîna Newsîrwan adil û mîna aristokratekî frensî kubar, diltenik û centilmen bû.”

Lijneya Rêveberiya Navendî, ya HA-DEP'ê ji bo pirtûkeke belgeyî, ji bo bîranîna Muhsin Melik biryar stand û di pûşpera 1996'an de jî pirtûk çap bû. Pêşgotina vê pirtûkê Serokê Giştî yê HA-DEP'ê Murat Bozslak nivîsiye. Der heqê Muhsin Melik de Bozslak wiha dibêje: “Piştî damezirandina HA-DEP'ê jî, bo sohbetekê em li cem hev bûn, wekî tê zanîn di 6'ê Sibata 1994'an de êrîşek

anîbûn ser mala min, û ez birîndar bûbûm. Ji ber vê sedemê Muhsin Melik, ji min qehirîbû, gote min divê em zû bi zû postê bi destê kûçikan ve bernedin.”

Piştî vê axaftinê, bi 18 rojan Muhsin Melik û hevalê wî Mehmet Ayyıldız roja 2'yê Hezîrana 1994'an li navenda bajarê Ruhayê, li cih û warên pêxemberan bi awayekî hovîti û ji paş ve hate qetilkirin.


Kurtejiyana Muhsin Melik

Di sala 1951'ê de li Ruhayê hate dinê, bi eslê xwe ji gundê ‘Arapoku’ (Aşmalı) bû. Wekî ku ji paşnavê wî jî tê fêmkirin, hêla bavê ji mala melikan e. Muhsin Melik ji hêla dê ve jî xwarziyê eşîra Paydaşan e. Malbatên Melik û Paydaşan gelek car li parlamentera tirk Ruha temsil kirine. Bapîrê wî, Mustafa wê demê melîkê Heranê bû. Di sala 1970'î de Zanîngeha Çukurovayê Fakulteya çandiniyê kuta dîke. Di sala 1976'an de li Antalyayê dest bi muhendîsiya zîretê dîke, piştî ta'yîna xwe radike Ruhayê, di gelek sazîyên cihê cihê de, li Ruha û Amedê dixebite. Li Amedê di sala 1968'an de tê girtin, beriya wê bi çend mehan li Ruhayê jî di dema belavkirina afîşên DDKO'yê dîke, cara yekemîn tê girtin. Du mehan li Girtîgeha Amedê radizê. Piştî derdikeve, wî sirgûnî Çankırıyê dîkin. Di sala 1985'an de jî wezîfeya xwe ya resmî îstîfa dîke. Bi awayekî serbest dixebite.

SALIHÊ KEVIRBIRÎ

ÇAVDÊRÎ

MÎRHEM YİÇÎT



Di dîroka xayintiyê de altaxê yekemîn

Li Kurdistanê mentalîteya eşîrî, navçegêrî û perçeperestî dişkê. Felsefe û fikirkirineke din çêdibe. Em mîna netewe êdî wekî caran û zamanên buhurî bi çavên berê li xwe nanêrin, em îro jî her carê zêdetir bi xwe hesiyane, em xwe nas dikin.

Xurtiya neteweyekî di organîzebûna wî de ye. Neteweyek bi nisbet û dereca organîzebûna xwe dikare behsa xurtiyê û serxwebûnê bike. Em her saet, her roj, her hefte û her sal hinekî din serbixwetir dibin. Divê mirov li pîrsa serxwebûnê mîna prosekê binêre û mîna sistemekê vê pîrsê bigire dest. Ji vê awirê ve em di aliyên fikrî, siyasî, eskerî, dipolmatîk û li ser vê bîngêhê jî ji awira kulturî û şexsiyetê ve em ketine ser rîyeke bixêr.

Ev alî û meylek e helbet. Rastî û heşkeriyek e ku mirov dikare li welat û li derveyî welat bibîne û êdî bûye şîpa serekî di jiyana me de. Tiştê dijmin û neyarên me ditirsîne, dibe sebebe mitale û paxavên wan jî ev alî ye. Çu carî dijminan kurd mîna îro nedîtine û qet wekî vê kêlikê ji wan napelikînin.

Ji dijminên derve û dagirker pê ve hin dijminên din jî hene. Ev jî paşverûtiya navxweyî, navçeparêzî, malbatperestî û xayintiya malbata Barzanî ye. Ev îro di destên xêrnexwazên me de bûne maşîk û hejekî mezin ê nav piyan. Şoreş û giş hewlên ji bo yekîtiya kurdan bi vê malbatê re tîn hember hev û şoreş bi ku de diçe, berê xwe dide kîjan alî li wan diterpile.


Başûr mîna parçe wextekê hêviyek mezin bû ji bo temamê welat û giş gelê kurd. Li pey alîkariya kurdên çar parçe wextekê ev hêviyê mezin bû. Serokatiyên Başûr û bi dereca yekemîn serokatiya Barzanî û dewama vê serokatiyê ya kurê wî Mesûd Barzanî, giş derfet û keysên bêhejmar hatin destên kurdan, bi avê de berdan û bûn sebebên zîncîreke trajediyên yek ji ya din malkambaxtir. Barzaniyên ewil piştî şerekî 13-14 salan di zik hev de bi çarlepkan û biqulûz çûn destên şahê Îranê, “Karê min qediya ez hevdekî feqîr yê Xwedê me” got û dîndê kor Mesûd jî, di nav 7-8 mehan de carekê Saddam û cara duyemîn jî dewleta tirk vexwende nav welat û bû altaxê reqem yek, di dîroka xayintiyê de.

Malbata Barzanî ne bi tenê li parçeyê xwe, belê li welat giştî bûye bela. Di bin nîr û desthelatdariya vê serokatiyê de bi awayekî ku mirov encex karibe bi alîkariya gotîna “Sal bi sal, xwezî bi par” karibe îfade bike, rewşa gelê kurd li Başûr nebaştir û nebaştir dibe. Bi vê tenê jî nasekine ev malbat. Ji bo tiştê ku aniye serê wî parçeyê welêt bîne serê parçeyên din jî her bêşermî û mîna Apê Osman Sebrî dibêje her canxwulamiyê dîke.

Mirov bi wîjdanekî rehet û dil dîlneyîyêke temam kare bêje ku Mesûd Barzanî û dora xwe niha vê bîstîkê li Kurdistanê bûne maşîka milîtarîzma tirk û çepereke her hêza li dijî yekîtiyê û pêşketina kurdan. Rastiyek bêşik heye. Çi ye ev rastî?

Serokên Başûr nikarin civateke nû bikin, hew karin bibin merkeza xurt û neteweyî. Ne zanebûna wan, ne siyaseta, îdeolojî û moralê wan û ne jî şexsiyet û bêhna wan têrê dîke. Her wiha bawerîya wan bi xwe jî kême û di bin bawerîya lazîm re ye. Giş hewlên wan navçeyî, lokal û biçûk in. Serokên Başûr bi tenê heg ji barê wî parçeyî dernakevin û nikarin barê ku divê hilgirin, hilbigirin. Bi dehan car e ku di bin bar de dikevin û bi her ketinê re jî zêrê zîyanekê din didin gelê kurd. Pratiqa 30-40 salên dawî li ber çavan e. Bila kes jî niha û pê de jî nefikire ku malbata Barzanî û serokên Başûr dê karibin ji kurdên re tiştêkî biked bikin. Bi gotinên din hewcedarî bi firehkirin û neteweyîkirina berpirsiyê heye li Başûr. Heger berpirsiyartî fireh nebe, hêz û partiyên din yê parçeyên mayî yê welat jî û nemaze şoreşa Bakur li ser qedera gelê kurd li Başûr nebin xwedî gotin û ji siyaseta bêperwa û dijminparêz ya serokatiya PDK'ê re sinorekî daneynin, tiştên hê ecêbtir dikarin biqewimin.

Girtina IHD'ê biryara MGK'ê ye



Ji roja damezirîna IHD'ya Amedê heta îro, hûn dikarin behsa xebatên xwe bikin?

○ Berî her tiştî cihê ku ihlalen mafên mirovan bi awayekî xurt lê hebin, li wê derê saziyên bi vî rengî tene dameziran-din. Bi taybetî li herêma me ji destpêka sala 1990'î û vir de bi awayekî xurt, mafên mirovan tên bînpêkirin.

Komela me bi giştî, piştî serlêdanan dest bi xebatan dike. Gava em bala xwe didin serlêdanan bi piranî, "binçavkirin, îşkence, di bin çav de windakirin, kuştinên kiryar nediyar, şewitandina gundan û di demên paşin de jî di malan de busedanîna polîsan tên dîtin.

Hûn jî bo sekinandina ihlalen mafên mirovan çi dikin?

○ Wekî hûn jî dizanin IHD saziyeke li derveyî hikûmetê ye. Ji bo pêjinkariya raya giştî ya der heqê ihlalen de, em agahiye pêşkeşî raya giştî dikin. Serlêdanên ku li şaxa Amedê û şaxên din hatin kirin, ji aliyê komîsyona me ya parêzeran ve tên pêşkêşkirin ji Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê re.

Bi taybetî serlêdanên ku li ba me dicivin, em jî Rêxistina Eftûyê ya Navneteweyî (AI) ji wan agahdar dikin.

Ji ber ku em bi FIEF'ê re dixebitin, hin ihlalen ku tînin kirin, hinekan jî wan em radigihînin wê rêxistinê. Her wiha em heyetên ku tînin ba me jî der barê ihlalen de agahdar dikin.

Gelek heyetên ku tînin de kesên navdar

cih digirin û gelek heyetên biyan tînin Amedê. Ew heyet bi taybetî di dema Newrozê de tînin. Gelo hûn bang dikin, an jî bi çi awayî tînin bi we re dixivin, agahiyan distînin?

○ Na, tu carî rewşeke me ku em heyeta dawetî wê derê bikin çênebû. Lê belê IHD di warê ihlalen de xebatên cidî

Ev biryareke siyasî ye ji ber ku beriya demekê, li dijî hin saziyan rapora MGK'ê hatibû rojevê. Di wê raporê de di hate xwestin ku di serî de divê şaxên IHD'yê bi taybetî jî şaxên herêmê û hin saziyên sivil xabêten wan bêne astengkirin. Lê bi tenê sedem ne rapora MGK ye, piştî destpêkirina dakirkirin û operasyona Başûr biryareke bi vî rengî me şaş nake. Ji ber ku me gotibû wê tesîra operasyonê li Bakur jî bibe.

dike, ev jî ji aliyê heyetên ku tînin wê derê ve tînin. Ji ber wê yekê ev heyet jî, jivanê (randevûyê)-ji me dixwazin, çawa ku em der heqê ihlalen de ji her kesî re vekirî ne, em wê daxwaza hevdiîna wan jî dipejirînin.

Hin caran em jî bo windakirinên di bin çav de bangî Rêxistina Eftûyê ya Navneteweyî dikin. Ew rêxistin li ser wê banga me kampanyayan dide despêkirin. Hin heyetên biyan jî di bin tesîra wê kampanyayê de dimînin û berê xwe didin herêmê, tînin çavdêriyê dikin. Ev heyet hem bi awayekî şexsî hem jî bi gelemperî der heqê ihlalen de lêkolînan dikin. Dîsa em raporên xwe ji hin saziyên mafên mirovan re dişînin. Bandora ra-

porên bi vî rengî li ser heyetên ku tînin heremê, çêdibe.

Yanî hûn dibêjin di hatina heyetan de roleke me ya aktif nîn e?

○ Em her tim li ser wê mijarê radiwestin. Ihlalen mafên mirovan ne kêşeyeke navxweyî ye, meseleyeke navneteweyî ye.

Li heremê ihlalen mafên mirovan bi awayekî tund tînin meşandin. Em jî şexsiyeten serbixwe, saziyên demokratîk û derdorên ku bi mafên mirovan re eleqedar dibin ji bo çavdêriyan dawetî heremê dikin.

Hûn dibêjin em saziyeke cidî ne, tiştên ku we cidî û bi quwet dikin bi taybetî çi ne?

○ Belê divê pêşî ji quwetbûnê çi tînin fêmkirin, ew bê destnîşankirin. Bi taybetî ez bidim nîşan ku heger li herêmê parêzeran mafên mirovan dixivin û hin tiştan îdia dikin û ji aliyê raya giştî ve piştigiriya wê saziyê tînin kirin û li cihê, ger IHD bi quwet be, ew tînin wê wateyê ku li wî welatî ihlalen mafan zêde ne. Di wê maneyê de ez naxwazim ku IHD bi quwet be, cihê ku IHD lê ne bi quwet e, dide nîşan ku li wî cihî ihlalen mafan nîn in an jî pir hindik in.

Li her derê Tirkiyeyê bi awayekî gur ihlalen mafan hene. Şaxa IHD'ê ya Amedê jî şaxên din bêhtir di rojevê de ye û bêhtir xebata wê tînin dîtin, hûn wê yekê bi çi ve girê didin?

Ez dixwazim bersiva wê pirsê wiha bidim. Li herêmê her wekî Amedê,

nadin wan belgeyan, hûn wê helwestê çawa dinirxînin?

○ Li heremê ihlalen mafan ji aliyê parêzeran komîsyona hiquqê ve bi daxwaza serlêderan gihîştine Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê.

Em dikarin wê bibêjin, IHD'ya Amedê zordestiyên ku li ser tînin kirin, ji ber van serlêdanên li Dadgeha Ewropayê ne. Serlêdanên ku li komeleya me hatin kirin, me ji hezarî yek bir Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê. Lê belê serlêdanên li ber destê me ji %80 ji ber ku xalên peymanên navneteweyî hatine ihlalkirin, em dikarin bibin Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê. Digel wê rastiye jî hin rayedarên dewletê jî dibêjin ku di destê IHD'ê de formên vala hene, IHD van forman li gorî dilê xwe dadigire û dişîne Ewropayê.

Gava IHD xebata xwe ya li herêmê dike, rastî arîşeyên çawa tînin?

○ Li heremê şer hê jî didome. Ev şertên ku bi rihetî parêzeran mafên mirovan karibin xebata xwe bikin nîn in.

Berî niha bi çend rojan girêdayî navçeya Dihê (Eruh), gundê Parês hate bombekirin, di wê bombekirinê de jî neke bi navê Saliha Turhan hate kuştin, her wiha du zarokên wê jî birîndar bûn.

Heyetan xwestin ku bi mebesta lêgerinê herin gund, lê hêzên dewletê li ber wê yekê bûn asteng. Bûyerên bi vî rengî gelek caran tînin dîtin. Her wiha tînin zanîn ku li Liceyê bi darê zorê dixwestin gundiyan bikin cerdevan. Ji ber wê sedemê cara yekemîn heyet tevî zahmetiyên mezin ketin navçeyê, lê piştî wê bûyerê asteng li ber heyetên din ku xwestibûn bikin navçeyê, hatin derxistin. Qewimînen bi vî rengî li ber xebat û lêkolînen me dibin asteng.

Serlêdanên ku li IHD'yê tînin kirin, gelo wê bi xwe re çareseriyê bînin?

○ Heger ew kesên ku mafên mirovan bînpê dikin, bêne cezakirin, mexduriyeta mexdûran ji holê bê rakirin û ev çareserî jî mexdûr tetmîn bike, wê çaxê dibe ku radeya ihlalen dakeve. Lê mixabin li herêmê ev tişt nayên kirin. Ji ber van sedeman IHD di van şert û mercan de, ji hêla çareseriyê ve nikare bibe hêzek. Ihlalen bi awayekî sistematîk tînin kirin. Sedemên ihlalen îro, zagona birgehîna a îro û şerê ku li Kurdistanê didome ye. Sedemek jî ev e ku, kesên ku îşkence kirine tînin dikin nayên darezandin.

Li gorî gotina we mirov dikare bibêje ku qatîlên weşeta Girtîgeha Amedê serbest in?

○ Ev mînaka ku we da ji gelek destdirêjiyên li dijî mafên mirovan yek e ku di çapemeniyê de li ser hate rawestîn û gihîşt qonaxa darezandinê. Mirov dikare bibêje ku ihlalen nehatine ronahîkirin, bi gotineke din bi hezaran ihlalen hiquqî ku hatine veşartin hene.

Darizandina berpîrsên tevkujiya li Girtîgeha Amedê, ji bo dewleteke ku xwe bi hiquqî bi nav dike, skandaleke

IHD'ya Amedê xwediye cihêkî taybet e. Serlêdanên şaxên din li wê derê tînin nirxandin, nîqaşkirin û berhevkirin.

Hûn dikarin der heqê ihlalen mafên mirovan de agahiyan berbiçav bidin?

○ Li gorî serlêdanên ku li komeleya me hatine kirin, sê hezar gund hatine şewitandin, bi qasî wê jî cinayetên faîlî meçhûl çêbûne, dîsa her roj di ser 20'an re serlêdanên tînin kirin, ev serlêdanên bêyî îstisna di bin çav de leqayî îşkenceyê hatine.

Belê hûn dibêjin di destê me de hin belgeyan berbiçav der heqê ihlalen de hene, lê belê hin rayedarên dewletê guh



DGM'ya Amedê Sekreterê IHD'ya A Amedê Sinan Tanrikulu ji hêla polisan ve hate binçav kirin. Ji Dadgeha Ewlehiya Dewletê (DGM) Serokê IHD'ya Amedê û Cigirê Serokê Giştî yê IHD'yê Mahmut Şakar dema ku diçe cem Tanrikulu ji hêla polisên sivil ve tê binçavkirin. Di heman rojê de saet li dora 12:00'yan bi hêzeke mezin ji maseya komeleyan û ji maseya terorê, ve komeleya me hate dagir kirin. Dest danîn ser arşiv, kovar, pirtûk û raporên ji hundir û derve ku ji me re hatibûn şandin. Lê tiştên wiha neketin zabitin. Em dikarin bibêjin ku hinek belgeyên me hatin dizîn jî.

Roja îmê jî (23 gulan) li dora saet 17:00'an di sa ji emniyetê hatin komeleyê, bi belgeya ku walî îmze kiriye, li gorî xala 54'an a zagona komeleya qaşo ku me ew îhlal kiriye, komeleya me ji tevahiya çalakiyên xwe hatiye menkirin. Em dibêjin ev yek ne hiqûqî ye xala 54'an ji bo girtina IHD'yê nabe sedem. Ev biryareke siyâsî ye ji ber ku beriya demekê, li dijî hin saziyan rapora MGK'ê hatibû rojevê. Di wê raporê de di hate xwestin ku di serî de divê şaxên IHD'yê bi taybetî ji şaxên herêmê û hin saziyên sivil xebatên wan bêne astengkirin. Ji bo pêkanîna daxwaza wê raporê jî, wan dest bi wê xebatê kirin. Lê bi tenê sedem ne rapora MGK'ê ye, piştî destpêkirina dakirkin û operasyona Başûr biryareke bi vî rengî me şaş nake. Ji ber ku me gotibû wê tesîra operasyonê li Bakur jî bibe.

Sedemeke din jî ev e ku, li herêmê tê xwestin ku tiştên tarî werin kirin, failî meçhûl çêbibin, ji bo ku ev çêbibin divê roj dernekeve, tarîfî winda nebe. Ji bo van sedeman xwestin ku saziyên bi vî rengî bifetisînin. Ew însanên ku dixwazin saziyên bi vî rengî bigirin, rê li ber mafên mirovan digirin, divê bizanibin ku, wê rojek mafên mirovan ji bo wan jî pêwîst be, emê di rojêke wiha de wan jî biparêzin.

Ji bo wê biryarê, hem bi hiqûqa hundir, hem jî bi hiqûqa navneteweyî, bi teybetî jî, li Komîsyona Mafên mirovan a Ewropayê emê der barê Tirkiyeyê de doz vekin. Tiştê ku em bikin wê Tirkiye ji berê bêhtir ji wan îhlalên mafên mirovan bixe nav zoriyê.

Mîna pîrsa dawî ji bo çareserîya pîrsgirêkê hun dikarin pêşniyarên xwe binin ziman?

○ Îhlalên ku li herêmê tên kirin bi tenê wekî kêşeya mafên mirovan divê neyên nixandîn. Pîrsgirêka kurdî kirinê li dijî mafên mirovan jî bi xwe re tine. Heger em çareserîyeke erênî bixwazin, divê pêşî pîrsgirêka kurdî bê çareser kirin.

Bi vî awayî helwesta komeleya mafên mirovan jî heye. Heyeta ku serokê me yê giştî jî di nav de bû, ketin nav hewldanekê ji bo standina leşkerên dil ku di destê PKK'ê de bûn. PKK'ê jî gavêke erênî avêt û leşkerên dil berdand. Bi me ev gava PKK'ê ji bo çareserîyeke erênî hêja ye û gavêke e birûmet e. Heger dewlet jî, hin gavan biavêje wê rê li ber çareserîya pîrsgirêka kurdî vebe. Îhlalên mafan jî wê kêmbibin, dibê ku piştî wê yekê rê li ber aştiyê nîhayî vebe. Bi vî awayî çareserîya pîrsgirêkê divê bi riya diyalogê û bi awayekî aştiyane çareser bibe.

HEVPEYVÎN: AZAD ALTUN

mezin e. Hetanî ku ev şer bidome wê îhlalên mafên mirovan jî bidomîn. Her dem em wê dibêjin ku, heger kujerên kuştinên kiryar nediyar neyên dîtin, ewê bi xwe re xebera cinayetên nû bîne. Ev yek ji bo windakirin û îşkenceyê jî durist e.

Di navbera salên 1992-93'yan de nêzikî sê hezar cinayetên failî meçhûl hatin kirin. Lê dema ku em dêhn û bala xwe bidînin tê dîtin ku, di salên 1996-97'an de cinayetên failî meçhûl kêmbûne. Gelo di vir de rola IHD'yê heye an na?

○ Îro îhlalên mafên mirovan bi awayekî veşarî pêk tên. Ji ber ku sê hezar gund hatine şewitandin, gundên ku bişewitînin, tarûmar bikin nemane. Lewma jî şewitandina gundan jî kêmbûye. Çawa ku duh îhlalkirina mafên mirovan politikaya dewletê bû, îro jî ev rewş ne guheriye. Digel wê yekê jî em dikarin bi kurtahî bibêjin ku, di kêmbûna îhlalan de rola parazvanên mafên mirovan û IHD'yê ne hindik e.

Birêz Baydemir, wekî tê zanîn Artêşa Tirk Li Başûrê Kurdistanê operasyonêke berfireh daye destpêkirin. Der barê wê yekê de dîtin û ramanên we çi ne, norm û zagonên navneteweyî ji bo wê yekê çi dibêjin?

○ Belê ev operasyon ji aliyê raya giştî ve tê şopandin. Dewleta Tirk çiqas îmze avêtibe peymanên navneteweyî jî bi wê kirina (kiryar) xwe, wan peymanan binpê dike û kiriye. Ev yek li dijî "Peymana Cenevre ya Şer" ku dewleta tirk pejirandî ye jî. Di vî warî de Dewlet tu heq, hiqûq û normên mafên mirovî nas nake. Li hêla din amadekariyên operasyonê ji demêke durr ve tê kirin. Derbarê wê operasyonê de, di destpêkê de hem şexsî û hem jî ji aliyê IHD'ê ve xem û endîşeyên me habûn. Bi rastî ev tişt jî qewimîn. Derket holê ku di pêvajoya

operasyonê de nexweşxane û saziyên sivil hatine gulebarankirin, kesên birindar, nexweş û bêguneh bi awayekî "saddamwarî" ji hêla êrişkaran ve hatin qatilkirin, wê yekê jî têrê nekiriye mirov bi panzeran ve hatin girêdan û li kuçe û kolanên Hewlêrê (Erbil) hatin gerandin û teşhîrkirin. Ev sûcekî mirovatiyê ye. Çiqas ji bûyerên wisa durr be jî, mirovê ku ji xwe re bibêje "ez mirov im" bi wê yekê diêşe. Bi wê mebestê em wê hovitiyê şermezar dikin.

Mîna parêzvanekî Mafên mirovan, hûn di şer de qetliama li dijî kesên sivil ku tê pêkanîna û ittifaqa TC û PDK'ê çawa dinirxînin?

○ Ez wekî parêzer û mafparêzekî dixwazim nixandînen xwe bi minakên

Derket holê ku di pêvajoya operasyonê de nexweşxane û saziyên sivil hatine gulebarankirin, kesên birindar, nexweş û bêguneh bi awayekî "saddamwarî" ji hêla erîşkaran ve hatin qatilkirin, wê yekê jî têrê nekiriye mirov bi panzeran ve hatin girêdan û li kuçe û kolanên Hewlêrê (Erbil) hatin gerandin û teşhîrkirin. Ev sûcekî mirovatiyê ye. Bi wê mebestê em wê hovitiyê şermezar dikin.

"Konsensusa (lihevhatin) Şer a Cenevreyê", "Peymana Mafên Mirovan a Ewropayê" û "Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovan" ve girê bidim. Îro li gorî Peymana Mafên Mirovan a Ewropayê, ku dewleta tirk jî alîgirê wê ye û îmze avêtîye, ji îhlalên ku li wê derê çêbibe, berpîrs e. Kesên ku li herêmê dijîn, mafdar in ku li dijî erîşên hêzên leşkerî serî li wê komîsyonê bidin.

Ji ber wê yekê ev operasyon û ittifaq bi serê xwe, di serî de hê ku amadekariyê dihatin kirin jî, li dijî hiqûq û normên insani bû. Divê nahatina kirin. Li gorî xala 3'yan a "Peymana Şer a Cenevreyê" ev operasyon, wekî dagirkirina welatekî serbixwe tê nixandîn.

Divê navberê de, careke din tewra PDK'ê derdikeve pêş, PDK di sa. "Şerê Birakujî" yê anî rojevê. Hûn li wê yekê çawa dinêrin?

Di serî de em dibêjin, di her warî de, di her şert û şirûfî de "Mafê Jiyanê" yê mirovan divê neyê îhlalkirin. Di yiyabû PDK'ê jî bi vî rengî tevger bikira. Ji bilî wê ramanê em tiştêkî din rast nabînin. Haa! Ji bo wê yekê jî, xala herî girîng "aşî" ye. Bi wê mebestê, tevî PDK'ê hêzên din yê herêmê, heger li dijî aştiyê bin divê neyên erêkirin. Li hêla din "Dîroka Mafên Mirovan" ango Têkoşîna Mafên Mirovan, dîroka tevgerên siyâsî û tevgerên neteweyî ye. Di vî warî de, kesên ku îhlalên mafên mirovan herî dikin, kesên ku di nav civak û neteweyan

de tene perçiqandin, çewsandin feqîr û belengaz in. Ew kes jî, ji hêla dakirkeran ve tene bikaranîn. Mirov ji destpêkê dirokê dest pê bike, tê dîtin ku di dema kolederariyê de jî, kolederan kole bi hev didan kuştin, ew bera hev û din didan. Tiştê ku îro PDK dike bi rastî jî, ji wê rewşê ne durr û cihê ye.

Wekî tê zanîn beriya çend rojan di serî de Serokê Komeleyê Mahmut Şakar û çend rêveberên IHD'ya Amedê hatin binçavkirin, di wê navberê de Komele hate dagirkirin, di dawîye de jî, IHD ya Amedê hate girtin, ji îro pê ve hûnê çi bikin?

○ Di serî de, roja 21'ê gulanê li

Bîreweriya hunermendê

nemir Tehsîn Taha

Qeyd û astengên hunermendan gelek zor in, heta ku bigiha pileya hunermendiyê. Helbet ev wekî hunermend bi regekî giştî wê ciwan be, ger hunermend kurê gelekî bindest be mîna Tehsîn Taha. Tehsîn wekî hunermendekî kurd divêt çend qonax û asteng bihurîbin di jiyana xwe de.

Heke ji nêzîk ve li jiyana hunermendê nemir binhêrin, dê sê astengên pir bi zehmet diyar bin di bizavên wî yên hunerî de.

Yekemîn Tehsîn Taha dest bi bizavê hunerî kir di dewr û berên destpêka salên şêstan de, ew dem jî ne wekî demên îro bûn; li wan dema hunermendî ne bi sanahî bû, çimkî komeleya mirov di nav de dijiya harîkarî ne dikir, belkî bi dij rabûn jî ber çendî egerên aynî û eşaşîrî: Herwesana bi çavekî sivik berxwedana hunermendî dikirin, gelek caran ji lavjêbêjan re digotin mitrib, ev nav jî navekî ne layîq bû, êdî kesî piştgiriya hunermendî nedikir bi taybetî endamên binemalê, çimkî navê binemalê pê dişikest. Lê Tehsîn Taha ev hemû dane layekî û bi baweriyêke mukim berdewamî pê da.

Astenga duyemîn li jiyana hunermendê navkirî, ew bû ku Tehsîn Taha ji kesên yekê dihate hejmartin li devera xwe ku rêka strana nû ya kurdî girtiye. Strana kurdî berî wî hemû di qalibekî klasîk de dihate gotin, lê Tehsîn Taha awazê strana nû anî biyava hunera kurdî. Zehmeta vê astengê ew bû, berî wî çî berhemên strana nû nebûn yan gelek kêmbûn, heta ku şiyabûya sûdê jê werbigire. Serkêşiya rêke taze bê serbur wa bizanim sanahî nîn e. Lê li vê astengê jî ew newestiya û hunera nû bêveman û rawestan pêşkêşî gelê xwe kir.

Astenga sêyemîn ku ji van her duyên din bi zehmetir têt hejmartin, ew jî astenga bindestiyê bû. Tehsîn Taha wekî bi hezaran kur û keçên gelê kurd dil bi xemên bindestiyê



mişt bû. Tehsîn gelek stranên şoreşgerî gotine, lê derfet nebû ku kela dilê xwe hemûyê darêje ji ber rejîma dagirkera Iraqê, lewma jî piraniya stranên xwe bi remz gotine. Çimkî remz tenê riyek bûye ku dişiya berdewamiyê bi hunerê bide, eger na diviyabû dest jê berda yan milkeçiya dam dezgehên sîstemê bikira. Ligel vê astengê jî hunermendê navkirî bi sîngeke berfireh û bi sebra Eyûb Pêxember berdewam bi karê xwe da. Gef û lêdan û paşev birina çî tesîra xwe li ser nekir.

Bi vî awayî û bi van astenga û çendên di jî hunermendên berketî rêka rast a hişyarbûnê berneda. Çimkî qenaetek mikum peyda kiribû û baş dizani ku huner riyêke

pîroz e û rêka rizgariyê jî hemû qeyd û tixûban di wê rê re derbas dibe.

Lewre em jî bi dilekî germ û bi şanazî bîreweriya vî hunermendê hêja tînin ziman. Pê nevet nav û hunerê Tehsîn wê cihekî gelekî mezin di ezmanê hurenê kurdî de wê bigire û distarê wî heraye çî caran ranaweste.

RABE ÇOTYAR

Rabe cotyar

Delo rabe

Biwne erdê

Çol û beyar

Berdestê hewe cotyar

Xelkê hemiyar

Nanê xwe xwar

Tehsîn Taha wekî bi hezaran kur û keçên gelê kurd dil bi xemên bindestiyê mişt bû. Tehsîn gelek stranên şoreşgerî gotine, lê derfet nebû ku kela dilê xwe hemûyê darêje ji ber rejîma dagirkera Iraqê, lewma jî piraniya stranên xwe bi remz gotine. Çimkî remz tenê riyek bûye ku dişiya berdewamiya bi hunerê bide, eger na diviyabû dest jê berda yan milkeçiya dam dezgehên sîstemê bikira.

Çol bi dengê cotyara

Tova bavê wan beyara

Erdê we ye kesî nîne

Nedine zalimê cara

Evan deran, evan halan-

paşa birbû gelek salan

Derdê me ye nav me nema

Em neman cotyarê te ne

Eman nav erdê xwe sor ke

Nanê hemiyar jê peyda ke

Pê zarokê me azad ke

Derdê me ji nay me rake

(Tehsîn Taha)



Li navendên çandê çalakiyên vê hefteyê
Li Navenda Çanda Mezopotamya ya Stenbolê

● **1.06.97 Yekşem:** Ji NÇM ya Edeneyê konsera Koma Rewşen, saet:14.30

Ege Sanat Tiyatrosu 'Bay Z ben insan' (Birêz Z ez mirov...), saet:18.00

● **4.06.97: Çarşem:** Semîner; Mahir Günsiray, Nirxandina lîstika 'xizmetkaran', saet:18.00

● **6.06.97 In:** Konsera Metin Kahraman: "Stranên Dêrsimê- Mirovên kal distirên", saet:18.00

● **7.06.97 Şemî:** Ege Sanat Tiyatrosu (Birêz Z ez mirov...), saet:14.30
Sohbeta li ser belgefilmê İsmail Beşikçi, bi derhênerê film Ahmet Soner re, saet:18.00

Li NÇM' ya İzmirê

● **1.06.97 Yekşem:** Konferansa li ser jiyana û helbestên Ahmet Arif; Pêşkêşvan: Hayri Kako, saet:14.30

Konsera Koma Şengal, saet:18.30

● **3.06.97 Sêşem:** Konferansa li ser 'Nazim Hikmet û kurd' Pêşkêşvan: İsmail Gölbaş, saet:18.30

● **6.06.97 In:** Tiyatro ya Dengê Bahozê 'Hêviya me hûn in', saet:18.00

● **7.06.97 Şemî:** Çalakiyên zarokan (III)

Konsera Ozan Hogir, saet:18.00

Li BEKSAV'ê

● **3.06.97 Sêşem:** Bîranîna Nazim Hikmet û Orhan Kemal, saet:19.00

● **6.06.97 In:** Filmê 'Özgürlük Savaşçısı (Têkoşerê Azadiyê)' Derhêner: Alan Parker, saet:18.00

AWIR

Li dijî dagirkirina Başûr reaksiyonên tûj



Heftaya borî li dijî dagirkirina Başûrê Kurdistanê li derveyî welat û metropolên Tirkiyeyê gel, reaksiyon nîşanî dagirkirina artêşa tirk a başûrê Kurdistanê da. Li gelek deveran kurdistanîyan meş û xwepêşandan li dar xistin, balyozxaneyên tirk dagir kirin, li hin cihan jî, bi tevî ala tirk alên Îsraîl û Amerîkayê, maketên Mesud Barzanî şewitandin. Ji wan xwepêşandan û çalakiyan çend mînak:

Atîna: Roja 23'ê adarê li paytexta Yewnanîstanê Atînayê nêzîkî 300 kurdên ji her çar parçeyên Kurdistanê li ber Balyozxaneya Tirkiyeyê dagirkirina Başûr protesto kirin. Gelek dostên ereb, fariş, tirk û yewnanî jî beşdarî vê çalakiyê bûn. Rêvebirê komîteya saz-kirina meşê diyar kir ku dewleta tirk bi çapemeniya derewîn dixwaze gelên cihanê çewt agahdar bike. Her wiha wî got ku Bila tirkiye êdî bes dinyayê bi-xapîne. Di çalakiyê de sloganên kurdên başûrî mîna "Çehş çehş Barzanî, te dijminê tirk li Kurdistanê bi cih kir" "Tev îxanet e dîroka te, dê di rîya xayintiyê de here serê te!" bal dikişand ser xwe. Her wiha di dawiya çalakiyê de sirûda neteweyî "Ey Reqîb" hate xwendin û ala tirk hate şewitandin.

Stockholm: Roja 21'ê gulanê li Paytexta Swêdê Stockholmê bi beşdarbûna 800 kesî li ber deriyê balyozxaneyên tirk û Amerîkayê xwepêşandaneke mezin li dijî dewleta tirk û îxaneta PDK'ê hate lidarxisita. Di vê çalakiya

ku ERNK'ê li dar xistibû de, gelek rêxistin, endamên saziyan beşdar bûn.

Protestoya ku saet li 14.00 yan dest pê kiribû û bi danîna çelengên reş li ber her du balyozxaneyan dom kir. Kurdistanîyên ku ji gelek bajarên cihê yên Swêdê beşdarî xwepêşandane bûbûn, bi yek dengî helwesta dewleta tirk û îxaneta PDK'ê şermezar kirin. Diruşmeyên mîna 'bijî berxwedan, bimirê îxanet', 'berxwedan jiyana', 'gerîla lê dixê dewleta tirk têk diçe' û 'bijî Serok Apo' avêtin. Ev çalakiya ku nûnerê ERNK'ê tê de axaftinek kir, piştî xwendina mersên 'Ey Reqîb' û 'Herne Pêş' qediya.


İzmir: Roja 25'ê gulanê li İzmirê partiyên siyasî, navendên çandê, Rêxistinên Demokratîk ên Girseyî (DKÖ) û kovarên sosyalîst dagirkirina başûrê Kurdistanê şermezar kirin. Çalaki li ber avahiya HADEP a Konakê pêk hat û li dora 1000 kesî beşdar bû.

Partiyên wekî HADEP, SİP; ji navendên çandan jî, NÇM, HALK-EVİ, Navenda Çanda Alewîyan, TAYD- DER û gelek kovarên pêşverû, sosyalîst û welatparêz helwesta dewleta tirk a li hemberî başûrê Kurdistanê şermezar kirin. Lê hêzên dewletê vala nesekinîn û êrîş birin ser gel; di vê navberê de 18 kes hatin binçavkirin. Kesên ku hatibûn binçavkirin, piştî rojekê hatin berdan.

Azadiya Welat:
Stockholm/ Atîna/ İzmir

TÎŞK

BEKIR BAHOZ



Diwarojî netewe le metirsî da ye

Partî Dîmokratî Kurdistan (PDK), diway ewey rojî 31'î gelawêjî 1996, supay Iraqî dawetî kird û paytextî herêma Hewlêrî le ser sîniyekî zêr pêşkêş be rijêmi Baxdad kird, em car û rojî 13 gulan supay dagîrkerî Turkiyay bo ser xaki xwarûy Kurdistan dawet kir.

Banghêskirdinî supay Turkiye bo ewe niye ke dij be hereşey welatêkî dagîrkerî Kurdistan rabiwestê, çunke Turkiye xoy yekêk e lew welatnaney ke beşêk le Kurdistanî dagîr kirdiwe û be agir û asin legel gel da dedwê. Belkû hêrşî supay Turkiye be riwalet (be şewe) dij be gerîlakanî Kurdistan (PKK) e, belam le rastî da dij be sercem bizûtinewey Kurdistan e. Leweş bitrazê dij be welatekanî tirî hermêke ye, her weku Îran û Sûriye.

PDK her be wendewê ranewesta ke pêş serbazekekanî Turkiye bikewê, belkû le nawa şarî Hewlêr da komelkujiyekî encam da û çendîn kesî bêçek û bêtawanî paş dîlkirdinyan gulebaran kird.

Turkiye be sûdwegirtin le lawazbûnî layene kurdiyekan, le başûrî welat, hewl dedat xeynî dêrînî xoy, wate dagîrkirdinî wilayetî Musul bête dî. Bo bedihênanî ew nexşeyêş hawkarî tewaw legel Amerîka û Îsraîl da dekat.

Helbet aşkira ye ku tegerey here gewre le berdema cêbecêbûnî proje firawanxwaziyekanî Turkiye da xoragirtin û berhelîstî PKK ye. Boye Turkiye hêrîşêkî bê amanî birdote ser başûrî Kurdistan, le ser ew birwayey ke giwaye PKK lenaw berê û herêmeke bixate jêr kontrolî xoyewe.

Ca lêrewe aşkira debê ke hawkarî kirdin legel rijêmi Turkiye le bedihênanî nexşekanî da napakiyekî mezin e dij be sercem netewey kurd. Le katêkî wekû êsta da ke xak û netewey kurd be rûy hereşey dagîrkirdin û le naw çûn debînewe, pêwîst e hemû gelî kurd û hêze siyasiyekanî be yek helwest û be yek deng dij be Turkiye û nexşe gilawekanî rabiwestin. Egena, ewa hemû bîrpirsiyar debî beranbar be newekanî dahatûman.

Hin hêviyên dilşikestî

Piştî van gerên dûr û dirêj, min biryar da ku ez ji stêrkên ku li asîmanan dibiriqin pirs bikim. Wan jî got em mirovekî wisa nas nakin. Lê belê di encama hewldanên min de, gotin: “Beriya sedsalan, belkî jî beriya hezar salan stêrkek di nava komên stêrkan de hebû. Kevirekî mezin nêzikî wê stêrkê teqiya û piştê ew stêrk di nava asîmanan de winda bû.”

Ez ji welatê xwe dûr, li dar û bostanên xwe digirim. Bi her du çavên xwe di mala ji kevir û herî li ser Çiyayê Ararat ku ji avê sê hezar metre bilind hatiye çêkirin, tê de li germa agirê tifikê digirim.

Lê belê li şûna van daran, van çiyayên welatê şêr û xezalan, ez li hemberî xwe avahiyên ku ji pêncî qatî derbas bûne û wekî asîman û ewran kul kirine, dibînim. Hîtler û hevalên xwe yê nazi di van avahiyan de planên ji bo qirkirina cihûyan çêkiribûn. Vî planî di dil û ramanên mirovatiyê de cihêkî ne baş girtiye.

Beriyê pêncî salan, ev avahî ji bo cihûyan bûbûn goristan, lê vêga em nizanin wê ji bo kîjan gelî bibe goristan.

Di kolanên tarî de ne tenê li germa agirê ku li welatê geşbûyî digirim. Bi rûyekî spî li agirê ku di dilê insanên me de pê ketiye û germa wê roj bi roj digihêje her derê jî digirim, wekî ku dedektîfê bi qapûtekî dirêj li kolanên digerer şev û roj di şûna van insanên dilgerm de, li hemberî xwe kesên ku hêviya jiyana wan tefiyaye û bûne wekî robotên teneke dibînim...

Carina li ber van tabloyên jiyane, dilê min li hev dikeve û piştî tofaneke kurt berfa spî dibare li ser hêviyên min. Ji bo ku berfa li ser hêviyên min dibare bisekine, dixwazim mejiyê xwe bi tiştên din re mijûl bikim. Lê belê hewldanên min encamekê nadin. Bi van ramanên diçim li ber pacê û dixwazim bi insanên ku di kolanên re derbas dibin, bînerim û mijûl bibim. Her du çavên min li insanên ku di kolanên re derbas dibin e, lê belê ez dişa hêsirê ramanên berê me. Bi kurtî ev raman wekî benîşt bi min ve hatiye zeliqandin.

Ji welatê xwe hezar kîlometre dûr şev û roj nas nakim û li hestên xwe digirim. Ew hestên azad ku di nav germa hezkirina insanên de hatiye pijandin. Li dor xwe dinêrim, lê belê mixabin ne vegermiyê ne ji van hestan dibînim.

Bi rûyekî ecêpmayî, ku ez nizanîm dê bersiva min bidin an na, dişa jî pirs

dikim, ji insanên çavşîn û porzer:

– Li ku derê ne hestên min û we çî bi wan insanên ku dilê wan germ kir?

Ev insan, serê xwe dihejinin û wisa bersiv didin:

– Ev pirsgirêk me eleqedar nakin.

Bi van bersivan re bi dilekî bêhêvî winda dibin di kolanên tarî de. Ji xwe re dibêjim; “Ez jî kê dipirsim?” Di kolanên tarî de dema li ber kaviên xirabe re derbas dibim, dibêjim, gelo em tiştên xwe bidin piştê xwe û jî vê dinya ya kul û derdan bar bikin! Ez jî, nizanîm em çî bikin li van welatên biyan.

Di diê me de qereqol hatine avakirin. Hin leşker nobetê digirin li ber deriyên vê qereqolê. Çekên di destên wan de, darê ku di destên Azraîl de li ber deriyê dojêhê disekine, tîne bîra mirovan, di ber xwe de dibêjim: Pêwist e ku em vê qereqolê xera bikin. Ji ber ku ev qereqol dibin sedema ku em ji xwe re biyan bin. Sînor datîne nav welatê me, ji me diqetîne wanên hestên xwe di nava berfa li ser Çiyayê Zagrosê de germ dikin.

Dê werin em çima xera nakin van qereqolan?

Hê min jiyana tam nekiriye, xwe winda dikim li van welatên biyan. Diçim ku derê ji insanên pirs dikim; ezê çawa xwe bibînim. Ji bo vê jî, welatê ku min nedîtiye, bajarê ku ez neçûmê tune ne.

Piştî van gerên dûr û dirêj, min biryar da ku ez ji stêrkên ku li asîmanan dibiriqin pirs bikim. Wan jî got em mirovekî wisa nas nakin. Lê belê di encama hewldanên min de, gotin: “Beriya sedsalan, belkî jî beriya hezar salan stêrkek di nava komên stêrkan de hebû. Kevirekî mezin nêzikî wê stêrkê teqiya û piştê ew stêrk di nava asîmanan de winda bû.” Van geran jî encam neda; ne xwe ez li ku derê me? Di dawiyê de min biryar da ku ezê gaziyeke bidim rojnameyê. Lê belê piştî çend hefteyan tişteke ji wê jî derneket.

Kî dikare bersiva van pirsên tevlihev bide?

Pirsên me ev in:

Çî bi wan insanên me yê dilgerm hat?

Hestên me yê windabûyî li ku derê ne?

Em çima qereqolên ku li ser dilê me hatine avakirin xera nakin?

Ez li ku derê me?

Dema ronahiya wekî rojê ji pişt çiyayên me derket, li van welatên biyan em hêvîdar in ku bersiva van pirsan were dayîn. Ji bo vê jî, destê me li ser hev û din ne û çavên me jî li çiyayên welêt in...

PERWER BEŊÎ



Sirûdên Ehmed Huseynî



Ehmed Huseynî nirxeke bilind dide peyvên xwe. Di nav sirûdên wî de, peyv an tîra xwe berdide kûraniya dil, an jî rola xwe di sazkirina wêne û sembolan de dilîze û rê vedike li ber gelek peyvên gelêrî û ji bîrbûyî ku kirasekî nû li peyvê dike û di hevokan de bi xeml û xêzeke nû bi kar tîne.

Jin ser wan, bêyî ku ev berhem bikevin bin ronîya rexne û nirxandinê. Ev sirûd ji wan nivîsarên ku xwendevan ji xwendina sirûda yekemîn de tê digihîje ku ne bi pênuşeke normal, lê belê bi xwîneke germ, anîna cânêkî tenik, pêjinker û bi dilekî xemgîn (heta tu bêjî bes) hatine ni-

visandin. Helbestvan bi êşên kûr û fireh, bi nalînên tariya bêbînî û mîna kurdekî bi hemû babelat, derd, birîn, kêferat û psîkolojiyê bêsînor dikare bi sirûdên xwe re biherike û "Rono" (yara wî dibê), ne kilîta bihuştê tenê, belê dibe ki-

ya tal re, di her pevokê de, derdixîne. Lewre helbestvan nirxeke bilind dide peyvên xwe, hetanî ku tu nikarî pêrgî peyveke bêcih û zêde bibî. Di nav sirûdan de, peyv an tîra xwe berdide kûraniya dil, an jî rola xwe di sazkirina wêne û sembolan de dilîze û rê vedike li ber gelek peyvên gelêrî û ji bîrbûyî ku kirasekî nû li peyvê dike û wê di hundirê pevokan de bi xeml û xêzeke nû bi kar tîne. Sirûd di rengê pexşanê de ne, lê ji helbestan dagirtî û avdayî ne bi xweşiyê û girî, spehîbûn, bîranîn, bêhna welatekî bêxwedî û dûr, evîna mezin û kambax û berî her tiştî êşa dilekî rastgo û dilsoz, ev kanî tev de sirûdan di- bişkiyînin û cihekî taybet didin wan, di warê toreya kurdî de û min dixwest di vê kurte-dîtinê de bala kesên rexnegir bikşînim bi alî van afirandinên hejayî de, çimkî ev nivîsarên bilind bi hewceyî nirxandineke din û şîrovekirineke din in.

Hêjayî gotinê ye ku toreya kurdî (bi zaravayê kurmançî) di van salan de gavên ber çav bi nirx diavêje û Ehmed Huseynî, yek ji van navên girîng e di vê çarçoweyê de.

HELÎM YÛSIV

Ji weşanên Jina Nû li Swêd û di sala 1994'an de, pirtûka Ehmed Huseynî "Rona û Sirûdên bêrîkirinê" hatiye weşandin. Bi rastî mirov mat dimîne, dema ku dibîne berhemên wisa girîng bédeng, di bin çavan re derbas dibin û demên dirêj perdeya xwe diavê-

visandin.

Helbestvan bi êşên kûr û fireh, bi nalînên tariya bêbînî û mîna kurdekî bi hemû babelat, derd, birîn, kêferat û psîkolojiyê bêsînor dikare bi sirûdên xwe re biherike û "Rono" (yara wî dibê), ne kilîta bihuştê tenê, belê dibe ki-

Bi îhanetê re jîndariya aşîxwaz

MEDENÎ FERHO



Piraniya me li hêviya mezin a guhertinê bûn, da ku gelê kurd bi giştî daxwaza cîhanêke du cemserî, di nava hevkeşeyêke (dengeyê) rêkûpêk de dike. Her wiha rêxistin, serkêş û fermandarên hêzên kurd jî li gorî daxwaz û hêviyên komên xelkê di ve qonaxê de ne û amadeyî xweguhertinê ne. Bawerî ew bû ku ev mirovên bi çarenûsa çil milyonî dilîzin, têgihiştine ku komên xelkê çewtî û şaşiyên wan erê nakin û tevî şermezari û tewanbariyên wan nabin. Mixabin ê ku di nava hişmendî û baweriyêke xelet û şaş de bûn, ew em bûn. Li hemberî ve guhertina mezin, daxwaz û hêviya wekheviya cîhana kurdan a du cemserî, dibe pişgeriya tîr-gemari û zilimdarî. Cemserên dijberî hev û din: Îxanet û welatparêzî... Îxanet di lîteratûra kurdan de çasîk e...

Çasîk, çêlikê kerê ye û li hinek herêmên Kurdistanê bi gotina 'kûrkûrk' jî tê binavkirin. Hewn tê nagihîje ku mirovek wî navê lawîrê barkêş û çu çu bi dilrewanî li xwe dike. Di xêşim û nawîsên dîroka Kurdistanê ya veşarî de, ku van salên dawî ber bi gewreyî ve hinek gav hatibûn avêtin, pir balkêş e ku gelê kurd, heya îro bi îxanetê re jiyaneke aşîxwaz derbas kiriye. Bi îxanetê re jiyana aşîxwaz... Pir balkêş e!... Pir seyr û ecêb e! Pir, pir, pir!...

Lewre reş û spî di nava hev û din de wînda maye. Lewra dirust û xerab jî hev nehatiye bijartin. Lewre qencî û neqencî jî hev cuda nebûye. Lewre başî û nebaşî dijberî hev

derneketiye. Lewre paqijî û gemarî jî hev nehatiye bijartin. Lewre sayî û gelcoyî jî hev dîr neketiye û nehatiye naskirin. Û, Û, Û!

Lewre bira bi destên bira, bav bi destên kur, pismam bi destên cîran tê kuştin. Û lewra, di dîroka cîhanê de yekemîn car e ku ji bo pîrdariyê dilrewaniya serdestî û çend parîxweşiya ber Derya Spî û Tengava Stenbolê, hêzên kurd bi hêzên dijminan re êrîş birin ser nexweşxaneyê û bêçareyên birîndar kuştin, piştî kuştinê, laşê wan bi piştî panzerên dijminên dîrokî ve girêdan û li nava çarşî û bazaran gerandin. Êdî kirêfî û şûmîfî, jî ve mezintir tenê dimîne îxanet.

Berî ku ez dest bi nivîsandina xwe bikim min jî çend hevalên derdorên xwe pirsî. Pîrsa min li ser nivîsa min bû ku rewşeke awarte di nava tu gelê cîhanê de tune ye, bes di nava gelê kurd de heye, yanî bi îxanetê re jiyana aşîyane, çî tîne bîra we û hestêke çawa di hûnandina laşê we de derdixê holê. Kesê ku min jê pirsî di nava heyîreke mezin de, bi awirên vala li min nêrî. Tenê yek mirovî got ku rewşek wilo, béguman navekî din ye dojhê ye.

Béguman dîroka îxaneta kurdan navekî din e dojhê ye. Ku pêr, doh jîndar bûye, mixabin îro ev navê dojhî, bi kirin û bûyer û pêhatiyên genî jîndar dibe. Pir kes dibêjin şûnewarî, fîraze, yan jî dîrok neynika pêşerojan e. Wîlo xuya dike ku kurd ne hay ji şûnewariya xwe hene, ne firaza xwe dibînin, ne dîrokê jî xwe re dikine neynik. Derew e! Naxwe bi giştî jiyaneke wilo tîr-gemari nedikirin cîhana me. Bidine hişê xwe, serhildanên kurdan tev bi îxanetê hatine tefandin. Bi giştî!... Der barê serkêş, serdar û fermandarên kurdan de mirovên ku gelacî, telaqreşî û propagandayên çewtî û tîr-şermezari dikin bi piranî kurd in. Yanî bi daxwaz û rêberiya dijmin, berdeyama îxanetê bi propagandeya tîr-galegal û gotinê tê kirin. Pir balkêş e ku rewşên bîrên kurd jî li hemberî ve bextereşiya han bêzar û neçar dimînin. Aaaaa, wekî niha ku

bi hezaran esker û tank û top û cebîlxaneyên giran mîna firokan ku bi rêzanî û dawetnameya hêzên rêxistina Mesûd û S. Abdurrehman, dijminên dîrokî ye kurdan di başûrê Kurdistanê de cirîdê diavêjin. Îcar du tişt derdikevin hemberî me.

Yek: Ew navê ku me li jor got û navê din ye dojhê. Lê, navê din ku li bédengiya rewşên bîran bibe çî ye? Tîr-wiha di helbest û pîr nivîsên xwe de min aniye ziman ku 'bédengî mirina jiyane ye'. Gelo ev peyva han wê bibe navê ve rewşa awarte?.. Çiqasî mafê rewşên bîran heye da ku jiyane bikujin û navê kujerîya jîne li xwe bikin?

Heger ez bim, mîna her veketin, tîhnikdan, pişkiyandin û nûjeniya qonaxa îroyîn ku bi pîr berdelên mezin derketiye holê, rewşa îro ku li Başûr pêk hatiye, şerê cîhanêke nû ku tovê îxanetê bête sotîkirin e. Hêzên Mesûd, (ez naxwazî navê Berzanî bidim wî) mîna bespê Trûwa dane pêş dijmin û wan dixê nava reşariya dîrokê. Lê, mîna ewên ku bi ve rewşê razî ne, ta ku encam û hoyên kirêfî û tîr-geni, wekî baweriyêke polîtîk daxuyanî dikin. Dîlê mirov dixê... Jiyaneke şermezar, mirovaniyêke tewanbar!.. Mîna gorbihuştîyê Cegerxwîn, her gav û gotin û bûyer cegera mirov sofî dike. Her gav û gotin û bûyer dibe sersot (pîzot) û dikeve ser cegera gelê kurd. Her wiha ew qasî geş û tîr ronahî, ku mîna gulbijêrkên mitaxeyî jî, dikeve ser sifra dijmin. Gelo ev rastî, qet nayê bîra fermandarên PDK'ê? Yan anîna ziman û li dij derketina çewtiyên dîrokî, qet nayê hişê rewşên bîrên kurd?


Gelo, careke din dîrok wê rûdana xwe ya bi kelem, jar û zingarî, mîna demjiyanên berê wilo şermezar nîşanî me bide? Yan, wê cîhanêke du cemserî di encamê hevkeşeyî (dengeyî) de, ku êdî îxanetê de jîndariyê nebîne, derbixê hemberî me? Gelo!.. Gelo!.. Gelo!.. Ew qas can-goriyên dîrokî, ew qas canefsarên (gazî) dûrî

Ko-mara dirindeyan

Dema mirov ji dūr ve lê dinêre, rewşa ko-mara zîlamê kor gelekî tevlihev û bêpergal xuya dike. Hemû sazî û derdorên gurgparêz bi hev ketine. Komzûrîna gurgebozan ji ber dubendiyê bê encam qediya, niha jî bûne du şax li dijî hev dazûriyan didin. Serokê gurgebozên ciwan ê guhbel, xwe daye nik çêlikê gurgebozê pîr, dike zûrezûr. Pîreka gurgebozê pîr bi awayekî veşarî doza sergurgiyê dike.

Li aliyê din dêlegurg nikare rastguran di bin banê çeteyekê de bigihîne hev, le çeteyên xwe bi ser zirname û virguhêzan de dişîne. Bi vê jî namîne bertîlên ku dane wan, bi riswafî eşkere dike, ew jî vir û zirên wan zêdetir dike. Milê wê yê rastê li dijî wê dixebite. Ew jî hêrsa xwe ji serê cahşê gewherîn derdixe. Divê mirov vê yekê jî bipejîrine ku ko-mara dirindeyan di warê “dozînewe û duristkirdinî” çeteyan de gelekî serkeftî ye. Koma dirindeya li aliyê jêr ê welatê şêran ji xwe re çeteyek peyde kirine, pê karên pîs didin kirin.

Kemalist û osmanî ketine qirika hev. Li dijî hev meş û xweçoşdanan li dar dixin (xweziya xwe li dar bixin û her li dar bimînin). “Oxaxê qeşmeran ku hehecik jê re dibêjin “oxaxê pêxemberan”, li dijî benda hehecikan çî tê ber dev dibêjin. Demokratên gurgperest bi refên kevo-



kan diajon ser tîrên ko-marî.

Li baxçeyên sewalên dirinde û bi jehr rewşeke ne-asayî heye. Mar û dûpişk, gurg û dêlegurg, seg û bocî rabûne hev. Lê ew li hemberî xêrxwaz û mêrxasan dev ji dirindetiye bernadin. Beşê jorîn ê welatê şêran têrî wan nake, lepê xwe dirêjî beşa jêrîn jî dikin. Ji bo wan dirindeyan xwîna şêran şîrîn e, çî li jêr, çî jî li jor. Lê mixabin hin kereşêr jî vê yekê bêhay in, şêrbûna xwe ji bîr dikin, didin

pêşiya dirindeyan.

Li ser vê rewşê hewce dike ku em teşiya xwe bigirin destê xwe, helbestekê birêsin. Em bi gotinên strana Koma Amed dest bi ristinê bikin.

De lûr lûr, lûre teşiyê
Teşiya min ji dara dêr e
Gel birçî ewî têr e
Bo guran bûye kêr e
Bîşkênin vê teşiyê
Teşiya min bi poşiya sor e

Gel masî ew jî tor e
Gur di ser de zûrezûr e
Tif bikin rûreşiyê
Teşiya min kurmê ji darê
Ji gotina guran nayê xwarê
Çavsorê dor Hewlêrê
Nalet li vê teşiyê.

Li pey vê ristê divê mirov li ser dest-dirêjiya gurgan jî çend fetlan bide teşiyê.

Ne li jêr û ne li jor
Me navê bibihên
dengê ku dike zûrezûr
Em ne karik û berx in
Em dê wê kêra zengari
Ji nav dilê xwe derxin.
Meşa şoreşê dūr dirêj e
Her gava dirindeyan

Xaka şêran dike gemar û qirêj e.
Ser çiyên me bi mij û moran e
Ji xwe re dikolin çal û goran e
Ev cahşên ku ala wan zer e
Ger bibin jî mertal ji we re
Bi wê teriyê û bi zirîne
We rizgar nakin ji kuştin û birîne
Jêr û jor şêristan yek e
Ji dirinde û gurgan re kemîn û feq e.

QELEMŞORÊ TEŞÎNAS

BIXELAT...

XAÇEPIRSA BIXELAT (70)

XAÇEPIRSA

Çeteyên xwe li dara bixin	E	Li ser dara bixin	Z	Nerazî bûn	A	Ne em dixawê	B	Tîpêk kurdî	W	Di lêkî jiyan
Partîkê bêdê Kobanê	H	S	A	N	N	Q	R	Î	Sembola tepe	Ê
Partîkê bêdê Kobanê	D	E	P	Î	Î	Û	R	Î	M	
	S	M	Î	E	T	A	Î			
Derza li serê dara bixin	Î	B	A	C	E	T	N	Û	N	
Sembola zêzê Xalabê	O	S	L	P	Î	D	E			
Çî Beyaz	O	L	M	Î	L	Î				
Sûs Pirtûka	A	J	I	K	M	E				
	A	M	Î	R	S	A	K			

Bersiva Xaçepirsa 68'an


Xaçepirsa me bixelat e.
Di 15 rojan de çî bersiv
bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi
riya pişkê li 5 kesan belav bikin.
Xelata hejmara me ya 70'yî
Pirtûka Osman Aydar
"Kurdîstana bi fiftî-fiftî" ye
Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nixandin, divê
hûn
"Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin
xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana
xwe ji me re bişînin.




Pênc kesên ku xelata xaçepirsa hejmara 68'an kasete Ferhat Tunç
(Kayıp) qezenc kirine. Orhan Çabuk/ Enqere, Bülent Koç/ Edirne,
Mustafa Okçul/ Qeyserî, Selahattin Huzur/ Mersîn, Osman Altun/
Edene.

Kesên ku heftiya berê xelata me qezenc kiribûn: İbrahim
Altınışık/ Batman Mahmut Cengiz/ Hatay, Ayten
Çaçan/Buca, Bülent Bora/ Malatya, Ali İmren/ Ankara

Bernameye k MED-TV	Hût	Jêderk	Dayîn	Gurîşê Amerikayê
Rewşenbîr ek (wêne)	Bi kirdkî ber	Nav	Der, derî	
			6	Notayek Parkîtek
Erivan	2		Pêrkîtek Firaqek	Teşe
Ne birçî		Tipek	Navê herêmekî Gelekî Rojhilatê	5
Gîşk	7	Berhema şîr Cinavkek	4	Cinavkek Hesûd
		Yêzîdî Bend	8	Yê yekemîn
Pivaneke Romaneke M. Gorkî	3			Cephe
	Sembola nikelê	Kêlek Lîng	9	
	Sembola azotê	Paçê ku li cîlan dixin		
Birader, kek			Bi tîrkî tenî	



Serokwezîrê T.C'yê Erbakan jî îtiraf kir
ku ji operasyona Başûr bi riya
medyayê aqahiyê distîne!



WELAT

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayınçılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN
YÖYLER

NAVÎŞAN
Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX
(0 212)
251 90 13

Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN

Berpirsê Karên
Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN

Berpirsê Saziye
(Müessese Müdürü)
TAHİR ELDEMİR

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.

BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)
Nimînendeyê Giştî

yê Ewrûpayê:
Mazhar Günbat
Tel: 00 32
53 64 12 62

Brüksel
Suriye:
Jan Doşt
Helim Yüsiw
Berlin:

Silêman Sîdo
49-30-69002695

Hannover:
Selim Biçûk
49-5721-81360

Munchen:
Mahmut Gergerli
49-871-670884

Stockholm:
Robin Rewşen
46-8-7510564

Bonn:
Ahmet Baraçkılıç
49 228 66 62 49

Divê kurd bibin kurdên Kurdistanê

Piştî dagirkirina başûrê welêt, digel nîqşa li ser tîkiliyên rêxistinên kurdî û îxaneta PDK'ê, yekîtiya kongreya neteweyî jî nû ve bi awayekî taybet kete rojeva Kurdistanîyan.

Bi taybetî piştî operasyona artêşa tirk, bakur û başûrê Kurdistanê, ji berê bêhtir nêzikî hev dibin. Ev 15 roj in, MED TV ji her alî ve vîdeoyên pêşkêşî hemû kurdistanîyan dike. Ji aliyekî din ve ji bilî PDK'ê hemû rêxistin û partiyên başûrê welêt li dijî dagirkirina Başûr derketin, û ji bo PKK'ê piştigiriya xwe ragihandin. Li yekîtiya rêxistinên kurd û Kongreya Neteweyî me ditînen hin şexsiyetên kurd pirsî.

Li ser vî mijarê Endamê PKDW'ê Ali Yiğit ji rojnameya me re da zanîn ku dema damezrandina kongreya neteweyî derbas bûye û ev yek piştî dagirkirina Başûr ji berê pêwistir bûye. Yiğit wiha got: "Kongreya neteweyî ji bo gelê kurd jî av û nêr pêwistir bûye. Ev kongreya ku bê avakirin wê ji her alî ve bibe mêjiyê Kurdistanê. Her wiha divê kongreya neteweyî hemû parçeyên Kurdistanê binimîne."

Ji layekî din ve, Yiğit der barê xebatên PKDW'ê de jî daxuyand ku PKDW'ê ji bo kongreya neteweyî gava yekemîn e û got ku ew dê di 31'ê gulana de li Brukselê civîneke dorfirêh saz bikin. Her wiha endamê PKDW'ê bal kişand ser komîsyona PKDW'ê ya ji bo Başûr û da zanîn ku vî komîsyonê li Başûr komîsyonekê parastinê damezirandiye. Di dawîya axaftina xwe de Yiğit diyar kir ku, digel hemû mercên neyînî ewê ji bo pêkanîna kongreya neteweyî tê bikosîn.

Nivîskar û lêkolîner Dr. Siraç Bilgin, pirsên

me bi şeweyekî rexneyî û xemgîn bersivandin û da zanîn ku ji bo kongreya neteweyî kurd gelekî dereng mane û got ku, kesên ku gotina 'hê zû' ye dikin, xayin in. Bilgin bi dilekî xemgîn wiha axivî: "Her cihê Kurdistanê di bin destê dagirkeran de dinale! Hê jî hinek dibêjin dem nehatiye. Gava ku dibêjin dem hatiye, dema tu dibêji gavan biavêjin, îcar dest diavêjin bahaneyên zarokan."

Dr. Bilgin der barê astengên li ber yekîtiya kurdan jî bi taybetî bal kişand ser bandora dijminê kurdan a li ser rêxistinên kurdan û diyar kir ku di berika hin tevgerên me de destê dijminên me heye, ev li ber yekîtiya kurdan dibe asteng. Nivîskar Bilgin daxuyand ku herkes dixwaze di gundekî de bibe axa û muxtar. Bilgin wiha berdewam kir: "Baweriya wan nemaye. Neteweyî rewş çî ye nizanin! Yekîtiya dikare çî bike. Ev yek baş nehatiye fêmkirin."

Siraç Bilgin, li ser firehiya Kongreya Neteweyî jî bi bir xist ku du welatên dijmin Tirkîye û Yewnanîstan ji bo ku kêşeyên di navbera xwe de çareser bikin, meclîseke rûspiyan hilbijartin û wiha axivî: "Van welatan bi salan hev û du perçiqandine, lê em wekî yek netewe, yek welat nikarin tişteki bi vî rengî bikin. Em xwe wekî kurdên "filan û bêvanî" bi nav dikin. Lê, em hêj nebûne kurdên Kurdistanê."

Her wiha kongreya Filistin û başûrê Afrika-yê bi bir anî û da zanîn kurd ji layê şoreşgerî, cesaret û kadroyan ve ji wan tevgeran gelekî pêşketîtir in, lê heman tişt ji bo yekîtiyê derbes nabe.

Bilgin di nîrxandina xwe ya ji bo PKDW'ê de daxuyand ku, wê roleke taybet bi cih aniyê

û tiştên pir xweş kirine. Siraç Bilgin, got ku, PKDW rola diplomasiya tevgera kurd bi cih anî û wisa peyivî: "Lê, hin tevgerên kurd ew wekî saziyê PKK'ê bi nav kirin."

Gerînendeyê weşanê yê Rojnameya Hêvî, Fehim Işık, di nîrxandina xwe de diyar kir, ku, di salên dawîn de xebatên ji bo yekîtiya kongreya neteweyî geş bûne. Işık wekî minak jî protokola PSK û PKK'ê da û got ku her çiqas ev xebata navborî bi sermeketibe jî niha di bin navê 'Platforma Rêxistinên Kurdan' de xebatên xwe didomîne.

Rojnameger Işık bal kişand ser girîngiya kongreya neteweyî û da zanîn ku dema damezrandina kongreya neteweyî derbas dibe. Işık wiha berdewam kir "Ev ne karekî hêsan e. Berî her tiştî divê partiyên sereke (PKK, PSK, YNK, PDK-Î) yê Kurdistanê li ser vî yekê li hev bên. Ji ber ku ji van partiyek li derveyî kongreya neteweyî bimîne ev xebat bi ser nakeve. Lê, tîkiliyên wan partiyên ne baş in. Her wiha divê bê zanîn, damezrandina kongreya neteweyî dawî lê anîna dagirkirina Kurdistanê Başûr e" Fehim Işık, li ser taybetiyên kongreya neteweyî jî daxuyand ku divê sînoren xebatên kongreyê bên destnîşankirin, di kongreyê de partiyek nabe serdest, hemû-partî bikaribin xwe îfade bikin û ji bo berjewendiyên gelê kurd xebatên xwe bimeşînin.

Gerînendeyê weşanê yê Rojnameya Hêvî, ji bo PKDW'ê jî diyar kir ku damezrandina parlamantoyan mafê hemû neteweyan e, lê, bi nêzîkîdayîneke wekî 'ezê damezirînim, hûn jî werin' parlemanto nayên avakirin.

MAZLUM DOĞAN

Ferhengok

erêkirin: tesdîq kirin
faşilbûn: pelişîn, tîkçûn
geşt: ger
gerdûnî: evrensel
hewn: aqil, mîjî
hişmendî: zanîn, (bîlînc)
kirêt: qirêj, qilêr
kujer: mîrkuj, qatil
nimandin: temsîlkirin
nîqas: gotûbêj

nîqas: xeyal
pêjinkarî: hesasiyet
pîle: derece
qaşo: goya xwedê giravî
remz: simbol
rûdan: qewimîn, bûyer
sanahî: asanî, hêsanî
şanazî: serbilindî, serfirazî
tore: edet
tîrûb: sînor
tund: sert, aşîrî, şiddetlî
zagona bîngehîn: anayasa
zargotin: folklor

berketî: hêja, birûmet
binemal: malbat
busedanîn: kemîn avêtin (pusu)
bere: enî, cephe
berbendkirin: qedexekirin
cemser: qutib
danezan: beyanname
darizandin: mehkeme kirin
dilkovan: xemgîn, dilkesar
dilrewanî: dilvekirî
dojeh: cehennem
eger: sedem, sebeb
erênî: pozîtîf

Kurdan dagirkirina başûrê Kurdistanê protesto kirin

Girseya HADEP'ê reaksiyona xwe ya li hemberî qetliama ku Barzanî li ser kurdan dimeşîne, hem bi sloganan û hem jî maketê Barzanî ku şibandibûn kerekî nîşan dan û sloganên wekî "Bijî bijî serhildan, serhildana gelê kurd", "Artêşa kujer ji Başûr derkeve", "Gelê me yê Başûr bi tenê nîn e", "Bijî serok Apo" avêtin.

Roja 25'ê gulanê li Meydana Sultanahmedê ÖDP'ê bi piştgiriya HADEP'ê "Ne Refahiyol, ne Hazırol (Ne Refahiyol, ne jî amade be)" mitîngêk li dar xist. Li gorî agahiyan nêzî 50 hezar kes beşdarî mitîngê bû. Her wiha gelek hunermend, rojnamevan, sendikavan û hin saziyên sivil û kesên navdar jî beşdarî wê mitîngê bûn. Di mitîngê de beşdaran lanet li dagirkirina dewleta tirk ya Başûrê Kurdistanê anîn û bang li rayedarên dewletê kirin ku dev ji dagirkirinê berdin. Dîsa beşdarên mitîngê digel alên Amerika û Îsraîlê, kûklayê Barzanî şewitandin.

Girseya HADEP'ê reaksiyona xwe ya li hemberî qetliama ku Barzanî li ser kurdan dimeşîne jî hem bi sloganan û hem jî bi gerandina karikatûrên Barzanî ku şibandibûn kerekî nîşan dan. Di mitîngê de girseya kurd sloganên wekî "Bijî bijî serhildan, serhildana gelê kurd", "Artêşa kujer ji Başûr derkeve", "Gelê me yê Başûr bi tenê nîn e", "Bijî serok Apo" avêtin.

Serokê Giştîyê ÖDP'ê Ufuk Uras, Serokê Giştîyê HADEP'ê Murat Bozrak û Rojnameger Can Dündar

xîtabî girseyê kirin.

Serokê ÖDP'ê Ufuk Uras bi piranî li ser pirsgrêka irtîca û kirêtbûna sistemê rawestiya. Wî, tu gotin li ser dagirkirina artêşa tirk a Başûrê Kurdistanê negotin. Li ser vê yekê girseya HADEP'ê reaksiyon nîşan da û alên ERNK'ê vekirin. Uras jî ber ku girseya kurd alên ERNK'ê vekirin jî reaksiyon nîşan da. Uras bi vê yekê jî nesekinî û wiha got: "Hevalên ser-bi-poşî wan alan deynin, heke hûn daneynin emê mitîngê îptal bikin." Li ser vê gotinê jî girseya kurd ÖDP protesto kir.

Piştî axaftina Uras, Serokê Giştîyê HADEP'ê Murat Bozrak di axaftina xwe de bi giştî li ser operasyona Başûrê Kurdistanê rawestiya. Bozrak diyar kir ku hemû welatên ewrûpî û demokrat dagirkirina Başûrê Kurdistanê protesto dikin, her wiha li Tirkiyeyê tu kes deng demaxe, ev jî nîşana felaketê ye. Bozrak axaftina xwe wiha domand: "Dewleta tirk bêdestûr ketiye axa bakurê Iraqê, dibêjin ku 'Barzanî gazî me kiriye' Barzanî kî ye? Barzanî dikare bangî Tirkiyeyê bike? Barzanî serokê dewletekê

ye? Ew serokê eşiretekê ye, ew jî bilî kuştina kurdan tiştêkî nake." Murat Bozrak bal kişand ser pirsgrêkên li nav Tirkiyeyê jî û axaftina xwe wiha berdewam kir: "Îro li vê meydana diz nîn in, îro li vê meydana rewşenbîr û hunermendên vî welatî, welatparêz û gel heye. Heger Şanar Yurdatapın ne girtî bûya, ewê jî beşdarî vê mitîngê bibûya. Li vî welatî hê jî rewşenbîran diavêjin girtîgehê. Ev welat hê jî bi Zagona Bingehîn a ku leşkeran çekiriye tê



rêveberin, kedkar li meydanan tîn jopkirin, bi dara êrişî ser xwendevanan dikin. Di bingeha hemû pirsgrêkan de kêşeya kurdî heye, heta ku kêşeya kurdî çareser nebe tu pirsgrêk jî ji holê ranabin." Bozrak da zanîn ku ew bikaribin kedkarê Zonguldağê û gelê Amedê binin ba hev, wê pirsgrêk çareser bibe.

Rojnameger Can Dündar jî di axaftina xwe de bal kişand ser şer û siyaseta Tirkiyeyê. Dündar, da zanîn ku telebeyên zaningehê jî aliyê polîsan ve lêdanê dixwin, jî ber ku ew dibêjin 'bila ev şer û xwîn bisekine' ew ne tenê ne, yê ku dibêjin 'bila di nava sîyasetê de artêş û çete nîn bin' bila zanîbin ku ew ne tenê ne. Îro dora we ye, ku hûn hev kêşiya sistemê saz bikin."

Her wiha Serokê Giştîyê KESK'ê Siyami Erdem, Cigirê Serokê DISK'ê Kemal Baysal jî axaftinek kirin. Zarokên koroya NÇM'ê Kulîkên Mezrabotan jî stran gotin û

di mitîngê de gelek kesên navdar jî hebûn wekî, Metin Akpınar, Müjde Ar, Tarık Akan, İlyas Salman, Halil Ergün, Genco Erkal, Rutkay Aziz, Deniz Türkali, Atol Berhanmoğlu, Yusuf Çetin.

Li aliyê dinê girseya HADEP û ÖDP'ê jî her alî ve ji hev cûda dihatin xuyan. Girseya HADEP'ê govê digirt, yê ÖDP'ê jî dans di kirin.

Berê jî li wê qadê du mitîng hatin çekirin bi piranî mitîngê ku DYP'ê çekiribû pir bal medyayê kişandibû ser xwe jî ber ku bi milyaran pere xerc kiribûn, dîsa jî 5-6 hezar kes hebû. Li aliyê din pir rojnamevan û nivîskarên quncikan jî didane zanîn ku girse bi piranî yê HADEP'ê bûye û ev girse wê wan partiyayî di rojên pêş de bibe meclîsê.

